



Lêkolînên kurdî...

Di rojên derbas bûn de, der barê tundî û dest-dirêjîya zayendî ya di nav lêkolînên kurdî de daxuyaniyeke anonim hate weşandin... Ger mirov ji nav daxuyaniyê peyva 'lêkolînên kurdî' derxîne, ev tundî û destdirêjîya nav sazî û dezgehên pênase dike... *Munewer Azizoglu / R.2*



Cavît Murtazaoglu tiya ra şî

Henî merdimî estê ti nas bikerê zî, nêkerê zî xebera xirabe a sere înan de merdimî xemgîn kena. Xebera serê hunermend Cavît Murtezaoglu de zî bi eno awa ya. Ma vernî de bawrin ew kam o? Cavît Murtazaoglu Îran ra bî. O Tebrîzê Îranî de hamew dinya... *Cemil Oguz / R.9*



Du çîrokên kurt

Ev çîrok di salên (1801-1894) ji aliyê Mele Mehmûdê Bazîdî ve ji zimanê farisî hatine wergerandin û bi xeta destan hatine nivîsîn. Ew beş ji 84 çîrokên kurt pêk tê. Ev çîrok di koleksiyona Aleksandre Jaba ya destnivîsên kurdî de cih digire... *Dildarê Amedê / R.10*

Rojnameya Heftane

www.xwebun.org

xwebûn

10-16 Tebax 2020

Hejmar: 34

Buha: 4 TL

rojname@xwebun.org

Ken ji dev û lêvan hêvî ji çavan kêmbûn

Ji derengmayîna min, ji xemsaî û sersariya min bihesibînin vê nivîsê. Bêguman ji heq nayê der li ser binivîsim. Nazdar e êşa nivîsê, giran e derdê hevokê, cînexweş in çêkirinên rêzikan li vê serdemê, ne tene qefê û ne jî tene xefê. Dîsa jî em neçar in li dora peyvê bigerin, ji çî ye nîzanim lê însan her dixwaze ruh bide hevo-

kên xwe û wan şîrîntir bike li ber dilê yekî/ê.

Li her peyvê disekinim, bi her hevokê re nikarim hevaltiyê bikim, bi her mirinê re dimirim, ji gewdê xwe bêzar û belawela me. Di vê navberê de nexweşiyek li me peyda bû, dibêjin hê jî bêhekîm û bêderman e... *Rojkum Berket / RÛPEL - 5*



Zarokên Êzîdî yên ji DAIS'ê rizgarbûyî

Rêxistina Lêborînê ya Navneteweyî (Amnesty) der barê jin û zarokên ji destên çeteyên DAIS'ê hatine rizgarkirin de bi sernavê "Mîrateya Terorê: Rewşa Xirab a Zarokên Êzîdî Yên Ji DAIS'ê Rizgarbûyî" amade kiriye û ragihandiye. Ev rapor ji 64 rûpelan pêk tê. Lêkolîna ji bo vê raporê di navbera sibat û tîrmeha 2020'an de hatiye kirin. Nûnerên rêxistinê li Herêma Kurdistanê di navbera 17-27'ê sibatê xebata qadê pêk anîne. Di heyama vê mîsyonê de, nûneran bi malbatan re hevdiîtin kirine... *Şaswar Mame / R.6*

Ziman şîrhelal e!

Berhemeke giranbiha li cîhana ranyarî û lêkoneriya kurdî zêde bû. Berhema Nûman Amed a bi navê "Etîmolojiya Azadiyê (Gotina Azad)" di vî warî de xwedî angaşteke mezin e. Amed, bi vê berheme xwe dispêre ponîjîn û lêkolîneke kûr, weke dozgerêkî ziman, çand, kevneşopî, dîrok, bawerî, têgîn û navgînan darazekê li meydana ramanê cîhanê datîne û didarizîne!.. Gelek zanebûn, ezber û nêrinên me, bi tespîtên zanyarî serobino dike...



Hevpeyva Mem Avba / R-4

Cotstandariya li dijî kurdan

Li gorî daneyên dawîn li tevahiya cîhanê hejmara pêketiyên vîrûsa koronayê ji 19 milyonan derbas bûye. Kesên mirine jî ji 700 hezarî zêdetir in. Tirkiyeyê jî bergiriyên li dijî vîrûsê sist kirine. Li bakurê Kurdistanê jî ji ber xemsariya dewletê ya li hemberî kurdan rewş hê girantir e. Nexweşxane kesên testên wan pozîtîf dertên, qebûl nakin û bêyî ku bergiriyê bigirin dişinin malê... *R.3*

Bi çanda dayikê tîn birêvebirin

Çanda dayikîyê ya bingeha avakirina civakbûnê ye, tevî hemû êrişên zihniyeta baviksalariyê jî di roja me ya îro de jî di hin civakan de hebûna xwe diparêze. Çanda dayikîyê bi kurtasî ew çand e ku ji aliyê jinan ve tê brêvebirin. Berevajî çanda baviksalariyê di vê çandê de jin rêveberên xwezayî ne yanî rêveberiya wê jixweber derdikeve holê. Di çanda dayikîyê de desthilatdarî tune ye... *R.2*

Peykerxaneya hosteyên Hûrriyan: Yesemek

Agît Yazar / RÛPEL - 12



Bajarek wêran bû

Li bendergeha Beyrûdê ya paytexta Libnanê teqîneke mezin rû da. Di encama teqînê de zêdetirî 150 mirov mirin û bi hezaran mirov jî birîndar bûn. Ev teqîn bû sedem ku bi dehezaran mirov bê cih û war bimînin... *R-7*

Zembîlfiroş û piyaseya zêr

Di warê dîroka çand û wêjeyê de ez naxwazim di ser gotinên wêjekar, helbestvan û nivîskaran bibêjim lê ez pêwîstî dibînim ku hinekî li ser kodên aborî yên ku di çîroka Zembîlfiroş de derbas dibin, behsa piyaseya kurdan a hêza standinê ku îro di pergala navneteweyî de wek Pariteya Hêza Standinê (PPP-PHS) û Katjimêra Gini bikim ku di heman demê de li ser hêza standinê û dahata kesên disekine... *Ramazan Tunç / R - 8*

'Helawa kurmancî erzan e'

Biwêj yek ji hîmên sereke yên zimên in. Nexasim ev ji bo zimanê kurdî wisa ye ku ji hêla biwêjan ve pir dewlemend e. Nivîskar Dilawer Zeraq ku bi berhevkarî û xebateke dûvdîrêj a 20 salan, Ferhenga Biwêjan amade kiriye li ser girîngiya biwêjan axivî. Zeraq nêzikatiya li zimên rexne kir û got, 'Helawa kurmancî erzan e'... *R.11*



Civakên bi çanda dayikê tên birêvebirin

Navenda Nûçeyan

Çanda dayikîyê ku bingeha avakirina civakbûnê ye, tevî hemû êrişên zihniyeta bavksalariyê jî di roja me ya îro de jî di hin civakan de hebûna xwe diparêze.

Beriya ku em derbasî civakên di roja me ya îro de, çanda dayikîyê di domîninê binin, divê em bi kurtasî çanda dayikîyê û çanda bavksalariyê çî ye wan bizanibin.

Çanda dayikîyê bi kurtasî ew çand e ku ji aliyê jinan ve tê birêvebirin. Berevajî çanda bavksalariyê di çandê de jin rêveberên xwezayî ne yanî rêveberiya wê jixweber derdikeve holê. Di çanda dayikîyê de tu faktorên civakê nayê paşguhkirin, her kes xwedî erk e û li gorî erka xwe tev digere û desthilatdarî tune ye.

Lê çanda bavksalariyê berovajî çanda dayikîyê bi zext, talan, kuştin û hwd. hatiye avakirin. Di vî çandê de rêveberiya bavksalariyê ne xwezayî ye, bi zorê derketiye holê. Mêr bi êriş û talankariyê çanda dayikîyê tîk bir û li ser çanda dayikîyê çanda xwe danî û wê jî wekî rastî pêşkeşî civakê kir. Di feraseta bavksalariyê de jin an bi temamî tune ye yan jî di rola ku mêr jî bo wê diyar kiriyê de ye.

Di roja me ya îro de jî hin qebîle yan jî komên biçûk hene ku ji aliyê jinan ve tîk rêvebirin. Di van civakan de hema hema em dikarin bîjin ku bi tu awayî tundî, zilm, desthilatdarî û hwd. tune ye. Di pergala van civakan de jin li her qadê xwedî gotin in. Jin jîyanê bi rê ve dibin û civak li dora jinan teşe digire.

Hin civak û qebîleyên ku di roja me ya îro de jî aliyê jinan ve tîk rêvebirin wiha ne:

Hopî

Civakeke çermosor e û bi sedsalan e li gundên bakur-rojhilatê Arîzonayê dijîn her wiha debara xwe bi cotkariyê dikin. Ev civak ji gelek klanên pêk tîk û ji aliyê jinan ve tîk rêvebirin. Di van klanên de her zarok dema bê dinê tev li klana dayika xwe dibe û di jiyana zarokan de jî bilî nasnameya dayikê tu nasnameya wan tune ye. Hopî her çî qas wek klanên bîjîn jî di nav wan de beşa herî girîng a xizmeta bine-malan e. Li her gundî du-sê binemal hene. Her binemal jî aliyê jina herî pîr ve tê birêvebirin. Di van klanên de karê çandiniyê jî aliyê mêran ve tê kirin lê debara wê teslîmî jinan tê kirin. Hejmara hopîyan roja me ya îro herî zêde 8 hezar e.



Civaka minangkabauyê

Civaka minangkabauyê ku ji aliyê jinan ve tê birêvebirin û qebîleyeke misilman e, li bajarê Bukittingi yê Endonezyayê dijî. Hejmara nifûsa civakê nêzî 5 milyon e û mîras jî dayikê derbasî zarokên keç dibe. Di vî civakê de berejavî civakên din jin dema bize-wice qelend dide malbata zava. Ev kevneşopî maf dide jinan ku bibe xwedîyê her tiştî. Di dema berdanê de mêr hemû mal û milkê xwe çî hebe dide jinê. Taybetmendiyêke din a vî civakê odeyêke taybet a jinan heye. Mêr dikare bi hevîna xwe re rakeve lê divê mêr bi derketina rojê re rabe û biçê mala dayika xwe taştê bixwe û ev rewşeke mecbûrî ye. Ev yek jî nişaneyê nirxdayîna dayikan e. Her wiha di nav civakê de di rêveberiyê de hem rola jinan hem jî rola mêran heye. Mînak, pêşengên qebîleyê piranî mêr in lê ev pêşeng jî aliyê jinan ve tê hilbijartin. Heke pêşeng di erka xwe de ne serkeftî be mafê jinan heye ku wî jî pêşengiyê bigirin.

Gelê akan

Gelê akanyê bi gelemperî li Ganayê dijî û civak jî aliyê jinan ve hatiye avakirin. Lîderên kabîleyê bi gelemperî mêr in lê mêr hêza xwe jî dayiksalariyê digire; hêz an jî dayikê tîk yan jî jî xwişkên wî tîk. Şahî û ayînan jin

bi rê ve dibin. Di heman demê de jî mijarên malbatî û xwedîkirinê re jî pêşengiyê dikin.

Gelê mosuonê

Gelê mosuonê ku li başûrê Çînê dijî, di nav civaka dayiksalar de cihê xwe digirin. Tu berpirsariya mêr a xwedîkirina zarokan û debara malbatê tune ye. Di vî civakê de peyva bav tune ye, jî ber vî yekê jî bo zarokan rola bav xal digire ser xwe.

Ji aliyê din ve jî ber ku civak jî aliyê jinan ve tê birêvebirin, di nav civakê de sîcên wekî tundî, dizî, tecawizê û hwd. di asta herî jor de ye.

Di vî civakê de dema jin rêveberiyê dewr digirin mêr hîn bêtir jiyanekê baş didomînin û tundî kêmtir dibe. Hema bêje tu berpirsariya mêr tune ye û jin berpirsariya ku di destê wan de ye jî bo pêkanîna bextewarî û aramiya civakê bi kar tînin.

Her wiha ev civak jî aliyê dewleta Çînê ve nayê qebûl kirin.

Qabîleya tuaregê

Li bakurê Afrîkayê zêdetirî hezar sal e li çola Sehrayê qebîleyeke misilman û koçber a bi navê tuaregê heye. Ev qebîle jî qebîleyên din ên mêran cudatir, jî aliyê jinan ve tê birêvebirin. Di vî qebîleyê de jiyana rojane jî aliyê jinan ve tê meşandin. Ev qebîleya misilman ku jî Berberiyên Afrîkayê ne, niv koçber in û hejmara wan nêzî milyon û niv e.

Di vî qebîleyê de wekî her tiştî zewac û berdan jî li gorî daxwaza jinan pêk tîk. Zarokên tîk dinê paşnavê dayika xwe digirin û civak li ser

çanda dayikê teşeyê digire.

Di nav qebîleyê de berdan gelek hêsan û jî rêzê ye. Hevjinên dema hev berdîn mêr vedigere mala dayika xwe. Lê jin bi piştgiriya malbata xwe kêfxweşiyek a berdanê li dar dixê. Bi vî kêfxweşiyê re malbat jî nû ve ezemmayîna keça xwe pîroz dike. Di nav vî qebîleyê de, jî derveyî zewacê tu cudahî di navbera jinên ezêb, pîr, ciwan, ên nezewicandî û berdayî de tune ye. Di vî qebîleyê de berejavî civakên din ên misilman mêr rûyê xwe bi paçekê digirin. Sedema vî yekê jî li gorî wan divê jin xweşîkbûna xwe venêşêrin. Her wiha mêrên tuaregî jî ber paça li ser rûyê wan bi navê ‘Mêrên Şîm ên Sehrayê’ tîk nasîn.

Li aliyê din, di nav qebîleyê de rêjeya xwendin û nivîsandinê gelek bilind e. Navê tuaregê bi zimanê erebî tîk wateya ‘Xwedê dev jê berdayî’ jî ber ev civak dîrî kevneşopiyên tund ên olî ne, ev nav lê hatiye danîn. Lê ev qebîle jî ber çanda xwe ya dayikê jî aliyê civaka misilman ve nayên qebûl kirin û niha ev qebîle jî aliyê parastina çanda xwe ve bi tîk nebûnê re rû bi rû ye.

Civaka brîbriyê

Brîbriyên li herêma bakurê Panama û Kosta Rikayê dijîn, xwedî çanda dayiksalar e. Civak li ser dayiksalariyê hatiye avakirin. Zarokên tîk dinê, rasterast dibin zarokên qebîleya dayika xwe. Di qebîleyê de qanûn û kevneşopiyên dapîran derbasdar in. Tevî ku mêr xwedî roleke girîng in jî bi qanûnî ne xwedî gotin in.



Di rojên derbas bûn de, der barê tundî û destdirêjîya zayendî ya di nav lêkolînên kurdî de daxuyaniyêke anonîm hat weşandin. Ev daxuyani jî hêla hin jinên di qada lêkolînên kurdî de dixebitin ve hatibû nivîsandin û bînav bi awayekî anonîm hatibû destnîşankirin. Piştî belavkirina vî daxuyaniyê bi giranî di nav tora lêkolînên kurdî (Kurdish Studies Network) de der barê teşe û helwesta daxuyaniyê de gelek nîqaş hatin kirin. Bi taybetî nebinavkirina kiryarên (faîlên tundî û destdirêjîyê) wek kêmasî hat dîtin. Ev daxuyani bi giştî balê dikişîne ser destdirêjîya mêran a li dijî jinan a nav akademîyê, bi taybetî jî ya nav lêkolînên kurdî. Di nivîsê de her wiha tîkiliyên hêzan ên newekhev tê şerm-zarkirin û destdirêjî wek pîrsgirêka pergale tê pênasekirin. Daxuyani bi helwesta li dijî destdirêjî û peyama piştgiriya jinên nav lêkolînên kurdî bi dawî dibe.

Ger mirov jî nav daxuyaniyê peyva ‘lêkolînên kurdî’ derxîne, ev daxuyani wek daxuyani/nivîseke gelemperî ku tundî û destdirêjîya nav sazî û dezgehên pênase dike, derdikeve pêşberî me. Ji xeynî peyva ‘lê-



Biyan

Munewer Azîzoglu
Bazan

kolînên kurdî’ ku em karibin vî nivîsê û mijara tîk de bi hin taybetiyên vî qadê ve girêbidin nayê xuyakirin. Lê divê ev nîqaş jî xeynî xalên hevpar ên bavksalariya gerdûnî û girêdayî vî tîkiliyên hêzî yê ne wekhev, pîrsgirêkên girêdayî vî qada lêkolînê jî bigire dest.

Bêguman tundî û destdirêjîya zayendî yek jî semptomên desthilatdariya civaka bavksalar e. Ango tenê yek minakeke jî zayendperestiya rojane ye û di her şaneyê civakê de di-kare bê dîtin: Zanîngeh, kargeh, hunergeh, mal, kolan û hwd. Lewma ye ku di salên dawî de bi taybetî bi kampanyayên wekî #metoo ev zayendperestiya rojane û sazûmankirî jî nav hunerê bigire heta nav zanistê, jî nav malê bigire heta nav kargehê bi giranî jî hêla jinan ve tê teşhîrkirin û ev yek wek amûreke tîkîşîna li dijî zayendperestiya derdikeve pêş. Her çiqas teş-

hîrkirina kiryarên guhertîneke bîngêhî çeneke û tundî û destdirêjîya li dijî jinan jî holê raneke jî wek amûreke texilker (caydirici?) û politikayê demkin bi kêr tîk divê bê kirin jî. Lê tevî vî divê tîkîşîna li dijî desthilatdariya mêr û newekheviya zayendan esas bê girtin. Beramberî vî hin taybetmendiyên sazî û dezgehên û bandora wan a li zayendperestiya mirov nikare paşguh bike. Di vî çarçoveyê de “qada lêkolînên kurdî” jî tîkiliyên zayendperest û desthilatdar azade nîk û divê di vî çarçoveyê de bê analîzkirin.

Her çî qas jî bo cihan û jiyana akademîk gotina “jî dem û warê serbixwetir” bê gotin jî ev tespît bi taybetî di qada “lêkolînên kurdî” de derbasdar e. Em bibêjin ev qad wek sazî yan jî enstîtuyêke akademîk a klasîk ne xwedî derî û pace ye. Li seranserê cihanê –bi giranî- mirovên der barê kurd û Kurdistanê de

lêkolînên dikin di bin sîwana vî navê de digihîjin hevûdu. Li kêmtir deveran rasterast di bin vî navê de saziyên akademîk hatine avakirin. Lêkolînê bi giranî di bin zanist û beşên wek oryantalist, îranîstîk, Rojhilata Navîn û yê bi vî rengî de xebatên xwe yê der barê lêkolînên kurdî de dimeşînin. Bi vî awayî rexneya ku di daxuyaniyê de tê kirin beşeke berfireh a cihana akademîk digire nav xwe. An jî divê bigire nav xwe.

Du mijarên girîng ên global di vî çarçoveyê de bandora xwe li ser lêkolînên kurdî jî dikin: sazûmankirina neoliberal a zanîngehan û helwest û politikayên zanîngehan (li kîjan deverî cihanê dibe bila bibe) ên li hemberî mijarên kurd û Kurdistanê –ku jî helwest û politikayên dewletên wan cudatir nîk e. Ev her du xal, hîn di destpêkê de çarçoveyê jî bo lêkolînên kurdî datînin.

Sînor û sînordarên wî xuya dikin û datînin pêş ava diherike. Ev yek rasterast bi tîkiliyên desthilatdariyê ve û beramberî vî bi pergala bavksalar ve girêdayî ye. Divê ne tesaduf be, jî hêlekê ve zanîngehên li rojavayê Kurdistanê di asta navneteweyî de nayên nasirin, jî hêla din ve bi milyonan euroyan di navbera zanîngehên Başûr û ewropî de proje tîk lidarxistin.

Di daxuyaniyê de kiryarên êrişên zayendperest wek kesên “bîhêz û payebilind” hatine pênasekirin. Mijar çî qas bindest û mazlûm dibe bila bibe ger lêkolînên kurdî bikeve bin siya kesên “bîhêz û payebilind” li wir jî xwe jî jî desthilatdarî û jî destdirêjîyê wêdetir tîkîstêki bi pêş nakeve. Bi hezaran kes li seranserê cihanê bi êş û hesreta welatê xwe, bi hêviya xebateke mayînde jî bo gelê xwe bi pênûsa xwe û bi serbilindî di bin sîwana “lêkolînên kurdî” de ke-deke mezin didin. Heqê tu kesê “bîhêz û payebilind” nîk e ku siyê bide ser keda tîk dayîn. Lewma jî tevî tîkîşîna hevpar û piştgiriya jinan divê kiryar bîkî teşhîrkirin û lêkolînên kurdî xwe jî tîkiliyên desthilatdar û destdirêjker azade bike.

Kurd di hedefa artêşê de ne



Kurd hê jî li leşkeriyê tîn qetilkirin û di rêya debarê de tîn derpkirin û kuştin. Di nav hefteyê de bi destê leşkeran 2 kurd hatin kuştin û 3 şivan jî bi awayekî hovane hatin derpkirin

Navenda Nûçeyan

Li Tirkiyeyê, bi salan e li dijî kurdan operasyonên siyasî û leşkerî tîn kirin. Di van operasyonan de bi hezaran kurd bûn hedef; an hatine binçavkirin û girtin an jî hatine birindarkirin û kuştin. Lê di demên dawî ji bilî operasyonên siyasî û leşkerî jî kurd dibin hedef. Ji ber nêrîn û hewldanên debara xwe ji hêla leşkeran ve tîn qetilkirin.

Di nav hefteyê de li Îzmîr û Wanê bûyerên ku dilê kurdan dax kirin, qewimîn. Li Îzmîrê ciwanê bi navê Osman Ozçalimli ku çûbû leşkeriya bi zorê ya dewletê, ji aliyê leşkerên ku bi wan re leşkerî dikir ve hat qetilkirin. Li gel ku Ozçalimli şeva hat kuştin, li bavê xwe geriyabû û gotibû ku gefên kuştinê lê tîn xwarin jî fermanarê artêşê xwestin ser rastiya bûyerê bigirin.

Destûr neda ala tirk

Ji bo vê yekê jî rayedarên dewletê xwestin ku nişan bidin Ozçalimli krîza dil derbas kiriye û ji ber vê jiyana xwe ji dest daye. Tevî vê daxuyaniya ji rastiye dût, der barê

kuştina Ozçalimli de daxuyaniyeke din jî ji hêla rayedarên dewletê ve hat dayîn. Di vê daxuyaniyê de jî hat angaştirin ku Ozçalimli xwe di avahiya lê maye de avêtiye û dawî li jiyana xwe aniyê.

Malbat Ozçalimli ji van daxuyaniyan bawer nekir û bertek nişanî van daxuyaniyan de. Bavê Ozçalimli Ahmet Ozçalimli, diyar kir ku tevî hişyarkirina wî jî kurê wî ji hêla leşkeran ve hatiye kuştin û daxuyani û raporên ku ji hêla rayedarên dewletê ve bîn dayîn bawer nake. Ji ber vê yekê jî dema weşartina kurê xwe destûr neda ku kurê wî bi ala tirk bê weşartin.

Giliya kujeran kirin

Dayik û bavê Osman Ozçalimli, Naciye Ozçalimli û Ahmet Ozçalimli der barê kuştina kurê xwe de serî li Serdozgeriya Komarê ya Qersê dan û giliya rayedarên leşkerî yên ku destê wan di kuştina kurê wan de heye kirin. HDP'ê bi bûyerê re mijûl bû û bi pêşniyazpirsekê kuştina Ozçalimli bir rojeva meclisê daxwaz kir ku ser bûyerê neyê girtin û faîlên bûyerê bîn cezakirin.

Zilma li hemberî kurdan ku bi destê dewletê pêk tê, elbet bi qetil-

kirina Ozçalimli bi sînor nîne. Li navçeyên Elbak û Ebexê yên Wanê jî 3 şivan û bazirganekî bûn hedefa leşkeran. Li gorî leşkeran hewldanên kurdan ên ji bo debarê sînc in. Divê kurd ne şivanî bikin û ne jî li ser sînorên ku xaka wan dabeş kirine bazirganiyê bikin!

Walîfî derewandin

Leşkerên ku bi vî zihnetiyetê tevdigerin û berê xwe didin Kurdistanê, li navçeya Elbakê derketin kontrola bazirganên li ser sînor û 3 şivanên li ber pez, bi awayekî hovane derp kirin û dest û piyê wan şikandin. Leşkeran ji bo vî hovitiya xwe angaşt kir ku her sê şivanan piştgirî daye bazirganên û ji ber vê yekê ev sosret anîne serê wan.

Li navçeya Ebexê jî leşkeran bazirganên ku li ser sînorê di navbera rojhilat û bakurê Kurdistanê de danûstandinê dikin, gulebaran kirin. Di vê gulebarana leşkeran de bazirganê bi navê İbrahim Baykara ku bavê 6 zarokan bû canê xwe ji dest da. Walîtiya Wanê kuştina Baykara berevajî kir û angaşt kir ku ji aliyê leşkerên Îranê ve hatiye kuştin. Lê malbata Baykara walîtiya Wanê derewand.

Li bakurê Kurdistanê Kovîd-19 bêtir belav dibe

Navenda Nûçeyan

Ray, li vîrûsa koronayê ya di dawîya sala 2019'an de li bajarê Wûhan ê Çînê peyda bû û destpêka sala 2020'an li seranserê cîhanê belav bû, nayê. Li gel ku dihat gotin dê di mehên havînê de kêmbibe û bandora wê bişikê jî vîrûsa koronayê her diçe belav dibe. Heta niha li tu dera cîhanê derman jê re nehatiye dîtin û pêşî lê nehatiye girtin.

Li gorî daneyên dawîn li tevahiya cîhanê hejmara pêketiyên vîrûsa koronayê jî 19 milyon derbas bûye. Hejmara kesên ji ber wê mirine jî bi seriya 700 hezarî ketiye. Welatê ku herî zêde mirov bi vîrûsê ketine Amerîka ye. Li welatê jî 4 milyon zêdetir mirov bi vîrûsê ketine. Li dû Amerîkayê Brezîlya tê û li vî welatê jî zêdetirî 2 milyon mirov bi vîrûsa koronayê ketine.

Rejîmê vîrûs li Rojava belav dibe

Rêveberiya Xweser destpêka pêvajoya vîrûsa koronayê bergiriyên baş girtin û bi qedexeyên derketina derve yên demên dirêj, li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê pêşî li belavbûna vîrûsa koronayê girt. Lê di rojên dawîn de ji ber ku Rejîma Baasê jî Şamê kesên bi vîrûsa koronayê ketibûn, bi balafiran derbasî Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê kir, vîrûs li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê jî peyda bû. Li gorî daneyên Desteya Tenduristiyê ya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê, li seranserê herêmê nêzî 100 kes bi vîrûsa koronayê ketine.

Qaşo serkeftî ne!

Li gel vê rewşa kambax jî li piraniya welatan bernameyên bergiriyê yên Kovîd-19'ê ji ber gumanên aborî hatine sistkirin. Lê di hêla mirovî de ev sistkirin gelek encamên giran bi xwe re anîn. Ev bû sedem ku bi hezaran mirov bi vîrûsê bikevin û bimirin. Ji dema ku bergirî hatine sistkirin ve ji beriya sistkirinê zêdetir mirov bi vîrûsê ketine û pê dimirin.

Tirkiye jî yek ji van welatan e ku bergiriyên li dijî vîrûsê ji meha heziranê ve sist kiriye. Desthilata AKP'ê her roj bi vî sistkirinê propagandaya xwe dike û dibêje ku pêvajoya Kovîd-19'ê bi serkeftî bi rê ve dibin. Li gorî vê propagandayê jî daneyên fermî yên ji rastiye dût radigihîne. Tevî ku rojane bi dehan kes dimirin jî herî zêde mirina 15-20 kesan tê ragihandin.

Li nexweşxaneyan cih nema

Ev berevajikirina rewşa koronayê ya li Tirkiyeyê, li dijî desthilata AKP'ê bû sedema bertekan. Di serî de partiyên muxalefetê gelek rêxistinên sîvil ve der barê de rexne li AKP'ê kirin. Partî û rêxistinên daneyên rêxistinên tenduristiyê yên bajaran parvekirin û ragihandin ku li gelek nexweşxaneyan cih nemaye ku pêketiyên vî-

rûsa koronayê bîn tedawîkirin.

Li bakurê Kurdistanê jî ber xemsariya dewletê ya li hemberî kurdan rewş hê girantir e. Li tevahiya bajarên bakurê Kurdistanê bergiriyên vîrûsa koronayê hatine rakirin û ji bo pêşgirtina vîrûsê jî hêla dewletê ve tiştê nayê kirin. Di encama vê yekê de li bakurê Kurdistanê her roj bi sedan kes bi Kovîd-19'ê dikevin û bi dehan kes jî dimirin.

Daneyên fermî ji rastiye dût in

Di demên dawîn de li Bakur jî ber ku nexweşxane tiye ne, kesên testên wan pozîtîf dertên qebûl nakin û beyî ku bergiriyên wan bigirin ew dişînin malê. Odeyên bijîşkan ên bakurê Kurdistanê der barê vê mijarê de daxuyani dan. Odeyan ragihand ku rewş gelek xedar e û jî desthilata AKP'ê xwestin ku bergiriyên pêwîst ji bo bakurê Kurdistanê bigire.

Dîsa parlamenterên HDP'ê jî der barê vê rewşê de daxuyani dan û destnîşan kirin ku daneyên Wezareta Tenduristiyê ya Tirkiyeyê ji rastiyan dût in û rojên ku bi dehan kes dimirin wezaret tenê mirina 20 kesî radigihîne. Hin parlamenteran jî mijar bi pêşniyazpîrsan bir rojeva meclisê û daxwaz jî rayedarên desthilata AKP'ê kirin ku bergiriyên bigirin.



Li dijî şaredariyê têkoşîna debarê dide

Bêrivan Kayi

Fatma Cengîzhan, 10 sal in li qada Cûmhûriyetê ya Dêrsimê fêkî û sebzeyan difiroşe û pê debara mala xwe dike. Cengîzhan da-yika 3 zarokan e, bi vî karî heta niha 3 zarokên xwe daye xwendin û şandine zanîngehê. Lê berya 20 rojan Şaredariya Dêrsimê destûr neda ku êdî Cengîzhan dezgehê xwe li qaşa Cûmhûriyetê deyne.

Ji bo ku vî pirsgerêka xwe çareser bike, Cengîzhan diçe şaredariyê bi şaredar Mehmet Fatîh Maçoğlu re hevdiîtin dike lê ev hevdiîtin jî nabe çare. Cengîzhan, der barê vî astengiya şaredariyê ya li hemberî xwe de diyar kir ku xesara wê negihîştîye tu kesî û wiha got: "Heta niha ji cihek din tu kesî negotiye tu çima li vir dezgehê xwe vediki. Lê şaredarî niha min jî vir diqewirîne. Ez vî neheqiyê qebûl nakim."

Cengîzhan da zanîn ku şaredarî neheqiyê mezî lê dike û ev tişt anî ziman: "Li şûna ku şaredar cihê kar li ber me veke, her roj ez jî van deran diqewirînim. Ger ku îro ev şaredarî di vî neheqiyê de îsrar bike ez ê dezgehê xwe bişewitînim. Dema ku ez dezgehê xwe venekim gelo ez ê çawa debara mala xwe bikim."

Di bin deynan de ye

Di berdewama axaftina xwe de Cengîzhan, destnîşan kir ku ji ber pêvajoya vîrûsa koronayê ketiye bin deynan û wiha domand: "Ev 6 meh in pandemiyê malik li me tevan xera kiriye. Gelo îro çima şaredarî malê li me xera dike? Bila xwedî li me derkeve. Hevjînê min jî naşuxulê carinan tê alîkariya min. Em her du jî bi vî karî ve girêdayî ne."

Cengîzhan bal kişand ser buhayên giran ên li ser fêkî û sebzeyên ku li marketan tîn firotin û ev tişt li axaftina xwe zêde kir: "Îro em meze dikin ku li marketan fêkî û sebzeyan bi buhayê zêde difiroşin. Piştî gelê Dêrsimê bi van bihayên giran şikandine. Lê ez û kesên wekî min bi zehmetiyeke giran diçin jî gundê derdora Dêrsimê fêkî û sebzeyên ku gundî bi keda xwe çandine tîn û bi bihayeke erzan difiroşin."

Di dawîya axaftina xwe de Cengîzhan bi lêv kir ku Şaredariya Dêrsimê berê wê dide cihekî ku tav lê heye û ev tişt got: "Ka ez ê di bin tavê de çawa li ber dezgehê bisekinim. Şaredarî bêtir daniyê li min dike. Ka çawa di bin tavê de sebzeyê xwe bifiroşim? Banga min li serokê şaredariya Mehmet Fatîh Maçoğlu ye; bila destê xwe ji nanê min bikişîne!"



DERFETÊN RONESANSEK XURT LI PÊŞIYA ME NE

Ziman şîrhelal e!

→ Mem Avba

Berhemeke giranbiha li cihana ramyarî û lêkolîneriya kurdî zêde bû. Berhema Nûman Amed a bi navê "Etimolojiya Azadiyê (Gotina Azad)" di vî warî de xwedî angaşteke mezin e. Amed, bi vî berhema xwe ya heja ku xwe dispêre ponijîn û lêkolîneke kûr, wekî dozgerê ziman, çand, kevneşopî, dîrok, bawerî, têgîn û navgînan darazekê li meydana ramanê cihanê datîne û didarizîne!.. Di vî berhema de gelek zanebûn, ezber, têgîştin û nêrînên me, bi tespîtên zanyarî û ramyarî serobino dike û berê me dide rastgîniya wan, ango 'xwezaya' wan. Lewre me jî xwest li ser vî berhema giranbiha hevpeyvînekê bi rêzdar Nûman Amed re bikin...

Rêzdar Nûman Amed, li herême qeyran û aloziyê mezin heye. Şer, mirin, hilweşîn, xizanî, wêranî, nexweşî-pan-demî... weke bangerekî di ser civakên herême re diçe. Di nav vî gelemşeyê de, dema mirov pirtûka te 'Etimolojiya Azadiyê (Gotina Azad)' dixwîne, mirov ferq dike ku şert û merc çî dibin bila bibin, rehê zan-yariya Rojhilata Navîn nayê qurmîçandin, her didome, diherike ev robar... Em dixwazin wiha dest bi hevpeyvîna xwe bikin:

Çima 'Etimolojiya Azadiyê'? Ango çima ne şer û alozî; çima ne helbest, an roman, çîrok, destan, bîranîn hwd. lê Etimolojiya azadiyê?

Di serî de mirov dikare bêje ku zimanê kurdî xwedî efsûneke kûr e û ji hêla dîrokê ve gelekî bargiran e. Zimanê kurdî, kurd e û çarenûsa wan ji nêz ve bi hev ve girê-dayî ye. Kurd û pîrsgirêka kurdî çiqas nepen e guman jê nîne ku zimanê kurdî jî wisa ye. Her çiqas roman, çîrok û destan ziman bidin hezkirin jî bi qasî etimolojiyê ne bihêz in û nexasim ev jî bo zimanê kurdî wisa ye. Eftimolojiya Azadiyê jî awayekî teng wêdetir li ser rexneya dara ziman a hind-ewropî xwe bi cih dike. Atlantîsa zimên bi hemû nişaneyan zimanê kurdî nişan dide û teoriya hind-ewropî jî binî ve şaş e. Angaşten teoriya hind-ewropî jî Hîtîtan wir ve naçin û teoriyek li ser sêgoşeya Grek, Latîn û Cermen hatiye lêkirin. Bêguman mijara Hîtîtan manîdar e. Di pêvajoya Hîtîtê de Grek derdikevin pêşiya me û mîna remza Hîtîtan heloyê duserî, hevşengiyek hind-ewropî tê avakirin. Zanista zimên neçar e bersivê jî vî re bibîne û îşaretên genetîk tîra xwe vî rastiyê berbiçav dikin. Civakê bi şewaza hind-ewropî ne gengaz e hebe û ne zanistî ye. Ji Avestayê despêkirina ontolojiya kurdî kêm û şaş e. Wê ev lêkolîn nehêle peraseya kurdî bi awayekî baş bê fêmkirin. Di navbera Avesta û ontolojiya kurdewariyê de qonaxên gelek dirêj hene. Ji ber nivîsarên sumerî divê referans Sumer be. Bi qasî tîgeha kûr, kûr-tî, ti tîgeha rastiya civaka kurd xweş pênase nake. Ger li ser vî tîgehe lêkolîn bê kûrkirin du tîgehe balkêş derdikevin pêşiya me. Yek, wezna hind-ewropî; du jî toriya nostratik ku ji aliyê zimanzanên rûs ve hatibû bipêşxistin.

Mirov di lêkolînê de dibîne ku tu bi ziravî û zîzbûna arkeologekî ketî pey şop û jêdera peyv û tîgînê bi eslê xwe yên vî

axê ne; ango ji sîngê Kurdistanê şîr mê-jane. Ev niha bibin malê tevahiya mirovahiyê jî çima nasnameya wan ya rastîn ewqas girîng e?

Taybetmendiyên civaka me perwerbûn û parvekerin e. Rewşa civaka me ne ji lewazbûna wê tê, berevajî wê ji xurtbûna wê tê. Azadbûn û xwebûn jî vî çandê tîne. Azadî û xwebûnê sexte napejirîne û çavên ku rast dibînin jî vî çandê ne. Ji destpêka mirovbûnê heta niha mezin û dîr-kûr dibîne. Hegemonê derdorê li gel vî çandê, ew derewker û dizek in jî. Sembolên dîtinê bi awayekî sembolî çav ketine nav gelek sembolên teolojîk ango mîtolojîk. Sembola kurdan di ser çav re derbasî rojê dibe û bi per e. Azad e û rast dibîne. Xwejbûrkirin bi şewaza pozîtîf lê tê ferzkirin û azadiya sexte lê tê mijandin. Azadî û azadî, xwebûn û xwebûn bi awayekî dijber li ser sifreyê hatine danîn. Ji ber vî jî kurd û civaka kurd ketine nav azmûnek gelekî dijwar. An wê cihanê rizgar û azad bikin, an jî wê azadiyek teng bipejirînin. Ji ber vî me bi peyvînan dest bi lêkolînê kir. Eftimolojiya Azadiyê nasnameya zimanê kurdî ye; xwebûn e, beden e û firdan e. Mîna du peyvên duçeng "st" û "xw" mirovahiyê hildigire û difirine. Ev duçeng baskên hemû zimanan in. Li gorî jî lêkolînê dawiyê em fêr dibin, di ser Sumeran re jî heta dawiyê bandor li zimanê semîtîk kiriye. Ji asoyên Zagrosan teyrê me difire û her çiqas weke Tawis piçek westiya be jî tîra xwe geriyaye...

Dema tu van tespît û analîzan dikî, rexneyeke zirav û kûr a bîrdozî jî li modernîteya navendî dikî. Baş e mirov dikare vî weke tîkoşîna bîrdozî û ramyarî ya di navbera her du modernîteya demokratîk û 'modernîteya kapitalîst' de binirxîne?

Rast e. Dilê min wisa bi xwezî ye. Dîrdan û zêçên jî zimanê kurdî peyda bûbûn zimanê hind-ewropî kirin zimanê modernîteya kapitalîst. Xweziya min jî ev e ku zimanê kurdî tov e û weke şaxek zimanê hind-ewropî nikare bê pênasekirin. Zimanê KURDÎ zimanê modernîteya demokratîk e. Hegemon ango nêçîrvanê bîjî (pîç) ku Sargon yek ji wan e, peyayê modernîteya navendî ye.

Bi zimanê me kurdan dijûneke gelekî xweş heye. Ev segbaz bi gotinek îdeolojîk û kûr hatiye tewanbarkirin. Kurê nêçîrvan bi qasî bê lanetkirin, ji aliyê xwedawendan ve li bajarê Agadê tê lanetkirin. Sargon bi rastî jî bîjî ye. Pevçûna destpêkê ya di navbera du civak û çandan de pêk hatiye, peçvûna bîngêhî e. Balkêş e, peyva 'mod' jî 'motika' mirîşkê tê. Ji bo mirîşkan li cihê kom bikin û hêkên wan bigirin, motikê danîn. Koka peyva modernîteyê mod-mot e. Enkîdû bi rêya jinekê girê didin. Yanî jin li vir motik e. Em motikê dizanin lê mot çî ye, me jî bîr kiriye. Ji bo wê jî kiryarên modernîteya dijber û peyvên hatine honandin divê em baş lêkolîn bikin.

Baş e te behsa windakirina rastiya xwezaya civakî kiriye, ev xwezaya hafî windakirin dê piştî ewqas berevajîkirin, çewtkirin û reşkirinan careke dîtîr bikare li 'XWE' vegere?

Bîngêha hemû peyvên zanistê bîsteh e. Jixwe bi yewnanî peyva zanist "epistîmî" ye û koka wê jî 'bîsteh'ê tê. Knowledge→ jî

proto-hind-ewropî ghenâ- / gēnâ- / gnō-, tēkildarî zan- ya avestayî, pehlewî dan-, farisî dan-, zazakî zanayen, sanskrîtî jânâmi, rusî знать (znat), almanî kann, swêdî kan (dikare) û kânna (nasîn), îngilîzî can (bixwîne: ken, "karîn") û know (bixwîne: nw "zanîn") jî îngilîziya kevn cunnan, bixwîne: kunnan. Ev nişaneyên etimolojîk der barê xwezaya civakî de jî gelek tiştan dibêjin.

Ji xwezaya civakî derbasbûna xwezaya xwezayî, wê me baştir ber bi rastiyên ve hilkişîne. Ziman derewan nake. Xwe-za, di ser xwebûna mirov re wateyê digire û koka xelk jî ji "xw"yê tê. Têkiliya zanebûn û zayîne jî dema mirov lê zêde dike, hemû angaşten li xwezayê hatine barkirin çavkaniya xwe ji mirov digire. Li gorî xwezaya civakî derdor pîvan û gihandîna zanebûna wê rastir be. Sosyolojî û dîrok ango felsefe li ser kîjan xwezayê hatine lêkirin? Ev gelekî girîng e.

Xebata te bi dilrehefî pala xwe dide raman û paradîgmaya bîrê. Ocalan û li gorî min te jî xaleke esasî ya gelek zirav mijar girtîye dest; ango ji derbirîna 'Xwezaya Civakî' pênase kiriye. Çima li şûna tîgîna 'zanist'ê te pênaseyê mîna 'xwezaya civakî' hîlbijartîye?

Em wisa bawer in. Ji bona me kurdan jî bilî vî jîyan ne gengaz e. Em xweza ne û xweza xira dibe ango xira dikin. Xwezaya herî nazik û şîrîn dayik e û ji bo vî min qala şîrhelalîyê kir. Xwezaya dayikê û xwezaya Kurdistanê yek tişt in û çiqas xwezaya me xira dibe destpêkê dayik diêşê. Şoreşger, nivîskar û gelek karmendên din ger şîrhelal bin, derfetên ronesansek pir xurt li pêşiya me ye.

Di berhemê de we beşeke mezin jî ziman, bêje û bîwêjan re veqetandîye. Di pênasekirin û ravekirina 'xwezaya civakî' de çima ziman ewqas girîng e?

Aha diyar e ez herî zêde li benda vî pîrsê bûm. Mîna di bersivên din de jî bal kişand ser vî xalê lê em niha kûrtir bikin. Civaka herî kevn xwedî xwezayek herî resen e. Civak jî bîjî dibin. Civakên li beriya jêr hatin jahrkirin, di heman demê de zimanên xwe jî afirandin. Hêza afirandinê di her du xwezayan de jî dayik û berjenga dayikê xweza, li beriya jêr tê berevajîkirin.

Balkêş e ev zimanê me çiqas xwedî wateyên xurt e. Peyva berrî jî wisa ye: Ji peyvê kurdiya kevn bi wateya "hişk" yan "req" ku serkaniya peyva "ber" (kevir) e jî. Dilkevir ango di afirandinê de req û bêberhemî jî vî peyvê xwestir ti carî nayê pê-

nasekirin. Enkiyê dilkevir hemû hêza afirandinê dike malê xwe; avis dibe û dizê.

Ev gelekî balkêş û dîrî heqîqetê ye. Lê mixabin bi mîtolojiyek derew mirov bi vî dan bawerkirin. Kolektîfa wateyên xwezayî yên peyvên kurdî di Sumeran de berevajî dibin. Ocalan di vî xalê de balê dikişîne ser xwedayê sîmerî Enkî. En-kî di wateya erd û ezman de yek xweda ye û zîlam e. Desthilatdariya li ser erd û ezman bi şeweyek desthilatdariya îdeolojîk çêdibe.

Di dînen semawî de xweda bav e. Di etimolojiya kurdî de bav ji bayê tê û ev bi şewaza xwedayê bayê derbasî nav hemû mîtolojiyan bûye. Ba, baran, av û avik bi tevgerên xwezayî yên demsalî ku bandorek mezin li ser axê dikin peyda bûne. Ax bi baranê û baran jî bi bayê ku li ser axê dibare avis dibe. Ba, baran, bav, av, avik û avis jî yek qurma peyvê tîne û bi temami xwezayî ne. Ev rastî û pîrozahî di Sumeran de berevajî dibin û di rastiya Enkî de xwediyê afirandina jêr û jor dibe zîlam û hêza zayîne dikeve destê zîlam. Ger bê bîra me Zeûs di her derê xwe de dizê û di her derê xwe de avis dibe. 'St' ya civaka xwezayî dibe sterlîn û dola wê jî dibe dolar. Peyva 'dolar' jî 'tal' a almanî tê û kok kurdî ye. Hevrehê soranî لۆڤ (do), feylî dül, farisî در (derê), jiari, belkî jî proto-hind-ewropî d'ol-, d'el- ku her wiha serkaniya heman peyvê ya bi gelek zimanên slavî (bulgarî / rûsî / sirbî / ukraynî: Долина / dolîna / çekî / polonî / slovakî dolîna) û her wiha gelek zimanên cermenî ye jî (îngilîzî: dale, danmarkî / norwecî / swêdî dal, almanî tal).

Mirov dikare bêje ku di pêkhatina hişmendî, hest û giyanî de ziman xwedî ris-tekê ye, yan jî encam û berhema van pêvajoyên pêkhatinê ye?

Bêguman wisa ye. Li gorî Noam Chomskî ziman genetîk e. Yanî tîsta derfeta hizirandinê dide ziman bixwe ye. Ger gena zimên hebe ev teqez bi hizirandinê ve tîkildar e. Ger genên mirov bi proteînê xwedî dibin û dijînin ev jî teqez bi axê re tîkildar e. Hemû elementên di gen û xwîna mirov de hene di axê de jî hene. Ji ber wê jî mirov hinekî lîloz, nêrgîz, soryas û genim e û dîsa hinekî ji ba û ava welatê xwe ye. Ziman ji çêbûna xwe ekolojîk û evîndar e. Gelekî balkêş e ku ziman bi qasî jinê mirovan evîndar dike ango nêzi dayikê dike. Çima? Ji ber ziman cihê jê hatiye nas dike. Ziman şîrhelal e.

Hêza afirandinê di her du xwezayan de jî dayik û berjenga dayikê xweza, li beriya jêr tê berevajîkirin



Ken ji dev û lêvan hêvî ji çavan kêmbûn

Rojkam Berket

Ji derengmayîna min, ji xemsarî û sersariya min bihesibînin vê nivîsê. Bêguman ji heq nayê der li ser binivîsim. Nazdar e êşa nivîsê, giran e derdê hevokê, cirmexweş in çêkirinê rêzikan li vê serdemê, ne têne qefê û ne jî têne xefê. Dîsa jî em neçar in li dora peyvê bigerin, ji çî ye nizanîm lê însan her dixwaze ruh bide hevokên xwe û wan şîrîntir bike li ber dilê yekî/ê.

Li her peyvê disekinim, bi her hevokê re nikarim hevaltiyê bikim, bi her mirinê re dimirim, ji gewdê xwe bêzar û belawela me.

Di vê navberê de nexwşiyek li me peyda bû, dibêjin hê jî bêhekîm û bêderman e. Hê zemanê berê rûspiyên me gotibûn wê dewranek bê; "dê kûçik ji kûçikî, gur ji gurî û însan ji însanî bireve." Rûspiyên me jî ecêb in, di her mijarê de di ser xwe re ne. Gelek gotinên xweş gotine, pê re jî yên nexweş darijijiyane.

Dibêjin di demtariyên zemanî de gotina herî xweş a helbestkî ye. Çendî rast e nizanîm, lê gelek caran gotina helbestkî jî li ber bejn û bala bûk û zeriyanê berxwedêr diqemirin. Ji ber ku ne hêsan e vegotina xem û kederê, behsa hîs û daxwazên keliyên dawî yên jiyana wan. Ez bixwe nikarim li ber ezameta wan bûk û zeriyanê berxwedêr, gotinê li hev bihonim, birêsim û bikim xweşgotina helbestkî. Heke ev eybek be, eyba min e...

Dîsa jî bêjim, dema min cara ewilî ew dît;

Pala xwe dabû çiyayekî û di ser êşên xwe de dinaliya. Êşên wê jî kûr bûn wek gelek êşan. Dilê wê nerm û xeyalên wê bêsinor bûn.

Hemû şevên pesara wî çiyayî sar bûn. Sira şevên tarî yên wê pesarê mîna kêrê dil diqelaşt. Di wê heynê de vîn diqerisî, ba direqisî, dil dilerizî û êş hinekî ji birîna xwe sar dibû...

Lê dîsa xwe ranedigirt û li jana dilê xwe vedigeriya. Ne dikarî ji bîr bike û ne jî dikarî bi têra dilê xwe xwedî bike. Mîna ku barê êş û xeman ew jar kiribe; li geliyê rûyê xwe xaçerêyên êşan venedişt. Tevî parvekirina barê êşan jî xwe bi tenê hîs dikir di hembêza çiyayên porspî de. Lê dîsa jî hêvî di seqema şevên dîn û har ên wî çiyayî de şîn dibû. Pala xwe dabû çiyayên xembar û êş bi rondikên çavên xwe aş û aram dikir...

Ji min re behsa çuyînên bêwext û her du xwişkên dikir. Xwişkên wê yên şehîd; Binevş û Sarya. Dixwest hê tiştêk bi serê wê de nehatiye, jiyana her du xwişkên a têkoşinê bi projeyekê bide nasîn. Gava qala wan dikir çav tiji dibû, ewirên çavan li xaka biharekê digeriyan û di ber xwe de digiriya ji bargiraniya êşên serboriya jiyana xwe...

Heke tiştêk bi min hat

Bipirsin ji xakên kevnar, ji bajarên birindar û ji çiyayên bilind û serdar. Dê vebêjin çîroka zeriyanê berxwedêr. Wê bêjin ew in ên jî mēj ve mirin kuştine, ew in ên dilê xwe li azadiyê vekirine, ew in ên jî welatê xwe re

bûk in û piştta xwe bi çiyayên xwe germ kirine. Wê çiyayên êşê bihelin li ber bedewiya kenê wan...

Ken ji dev û lêvan, hêvî ji çavan bû li ba wê, heza wê bû ya ji bo rengê şîn ku me pê dizanî. Hezkirina wê bû ya şênber ku tim di navenda keftûlefta jiyayê de serwer. Tîrsa wê hebû ya ne ji mirinê, ya jî fêmkorî û nefêmkirina jiyayê. Bawerî navnîşana wê bû ya ji hespê xwe nedihat xwarê û eniya xwe li her qadên têkoşinê dida...

Bêje ya ne bihîstî, ne binayî û ne jiyayî. Dilgermî û dilgeraniyê bêje bi rengê zaroktiya xwe yeko yeko.

Her yek çiyayek e, ji çiyayekî ye û çiyayî ye.

*Nakevin
Bilind û hêrs in
Nayên xwarê
Bilind û berz in
Di ser xwe re ne
Biçûk û bêxêr nabin
Ji xwe jî mizintir in
Tev stêr û stargeh in
Bawerî ne
Yek bi yek şêr û şepal in*

Li ba me pira di navbera mirin û jiyayê de herifiye, wateyek nû ya jiyaneke berz û bilind li xwe bar kiriyê.

Wext ji danê veqetîne ye. Mîna ku beytîkên bêwar, çûkên koçer û derbider bêne bîra min; koçeke zû û navlênebûyî, bi şarheşî-

noka xwe fîrya û çû ji vî çiyayî!..

*Lê "Li rûyê te dinêrim
ya di fotoyekî reş û spî de dibêşe"
Û her dijî li xwîna rayên dilî û dilê me...*



Civaka xwepêşanê û zimanê dayikê

Dogan Hejar

Guy Debord di berhema xwe ya navdar a bi navê "Civaka Xwepêşanê -The Society of the Spectacle(Gösteri Toplumu)" de bi berfirehî li ser bandora xwepêşanê ya li ser jiyana modern disekine û şîroveyan rasteqînî dike. Pirtûka wî camêrî, ji bo dahurandin û fêmkirina civak û pergalê weke nexşerêyekê ji mirov re dibe alîkar.

Lê armanca me ne nîqaşeke felsefî ye. Em ê tevî hin şîroveyên Guy Debord, meseleya bişaftin û zimanê dayikê binirxînin.

Debord pirtûka xwe ya navdar di dawîya salên 1960'î de nivîsiye. Tevî ku wê çaxê amûrên xwepêşanê ev çend bi pêş neketibûn jî wî tespîtên

pir girîng kiribûn ku bi tevahiya hêza xwe ji bo roja îroyîn jî derbasdar in. Ew dibêje, "ji bo civakê ya baş xwepêşan e û xwepêşan jî ya baş e." Ango dixwaze viha bibêje: Ger malê xwepêşanê be baş e, bedew e, nirxdar e, rast e, erênî ye, xurt e û hêjayî rêzê ye; ger ne malê xwepêşanê be xirab, kirêt, nehêja, derew, neyînî, lewaz û bêqedr e.

Îja em bîr ser asimilasyonê. Niha di roja me de ne zexteke dewletê heye ku kî bi kurdî biaxive rastî lêdan, girtin û cezayê pereyan bê ne jî astengî li pêşiya hînkirin û hînbûna zimanê dayikê heye. Helbet em nabêjin politikaya bişaftinê tune ye. Bi tenê rêbaz guheriye. Dewletê berê bi rêya dibistanan û bi darê zorê û tirsandinê dixwest vê yekê

pêk bîne lê niha dev ji wan rêbazên kevn berdaye lewre bîfêde bûn û rêbaza niha pir bibandor û bêxetere ye ku ji bo rêbaza nû hewldaneke taybet jî ne pêwîst e. Bi tenê ji bo kurdî nebe zimanê xwepêşanê heya jî dest tê astengiyên derdixê. Girtina Zarok TV'ê nîşaneya vê yekê ye. Li Bakur û Tirkiyeyê her ku amûr û alavên xwepêşanê bi pêş ketin, asimilasyonê û rêjeya kurdên bi kurdî nizanin jî zêde bû. Ji ber wê nirxandinên ota-similasyon-xwepêşanê jî qels dimînin. Ya em dixwazin bibêjin ne tunebûna xwepêşanê ye, sedema xwepêşanê ye lewre kesên bi destê xwe zarokên dibişivînin wê yekê ne ji ber fikarên ekonomîk dikin, ne jî ji ber fikarên mîna ku dê zarokên wan ji ber axaftina kurdî rastî teh-

deyê bîr dikin, bi piranî bi xwezî û xeyalên xwepêşanê çerxa bişaftinê dizivîrin.

Me li jor hinek anî ziman ku Guy Debord dibêje di xwepêşanê de çî hebe civak jî dixwaze wê bijî û hest û xwesteka xwe ya xwepêşanê biborîne, tadmîn bike. Debord mijara zimanê xwepêşanê û asimilasyonê negirtiye dest. Ya rastî piştî ew qas tespîtên rasteqîn, di vê der barê de kirpandineke taybet jî zêde ne hewce ye. Jixwe civaka li gor xwepêşanê ango li gor film, rêzefilm, bernameyên pêşbaziyê (mîna Survivor, Çarkifelek û hwd.), bernameyên zewacê û li gor fenomenên medyaya civakî jiyana xwe ava kir; hest û hewesên xwe beralî kir, helbet wê zimanê xwe jî ji zimanê xwepêşanê hilbijêre. Bifikirin bi milyonan kurdên hêj filmeke bi kurdî temaşe nekirine hene û jiyana wan bi temaşeya film û rêzefilmên tirkî derbas bûye û di qada xwepêşanê de ya mîna Debord diyar kiriyê bandora wê li ser tevahiya jiyana tevgerên me heye, yek hevokê evîniyê bi kurdî nebihîstine, wê çawa li şûna tirkî kurdî tercîh bikin? Jinên berê yên zêde duçarî TV'an nebûbûn û qet internet nizanibûn û tevî wê zarokatiya wan bi guhdariya çîrokên mîna Mem û Zîn, Siyabend û Xecê û çîrokên di nav dengbêjan de hatine vegotin derbas bibû, çî bûbûna jî bi zarokên xwe re, bi derdora xwe re bi kurdî diaxivîn lê jinên niha ango yên civaka xwepêşanê lava dikin bi zimanê xwepêşanê tirkî biaxivin.

Mirov biçê bi saetan li ser girîngiya zimanê dayikê û bandora wî ya erênî ya li ser zarokan bi dê û bavan re xeber bide û rastiya wê bipeyitîne ji piraniya wan wê dîsa ne zimanê dayika zimanê

xwepêşanê bi kar bînin.

Lewre ji bo çerxa bişaftinê bisekine divê televizyonên kurdî zêde bin; sînemaya kurdî xurt be û rêzefilm pir bin; dublaja film û rêzefilm man bi pêş bikeve û pirtûkxaneya bi kurdî bi wergeran dewletmîr bibê. Heya ev pêk neyên zû bi zû be jî hêdî hêdî be jî bişaftinê wê bidome. Ji ber wê kesêkê dixwaze pêşiya bişaftinê bigire û tevkariyê ji ziman û çanda xwe re bike divê li gor hêza xwe (dublaja filman dibe, wergera pirtûkan dibe, derhênerî dibe, nivîskarî dibe, listikvanî dibe an jî di vekirina televizyoneke kurdî de tevkarî dibe) hewl bide ku kurdî bibe zimanekî xwepêşanê. Helbet hewldana îqnakirina ji bo axaftina bi zimanê dayikê ango têkoşina di nav civakê de jî divê zêdetir be. Tevî vê ger kesek pirtûk, helbest, film û rêzefilmên xwe bi zimanê dayikê nenivîse û çêneke, ew kes tevkarî û desteka bişaftinê dike. Helbet îstîsna yên dualî jî hene ku him tevkariya bişaftinê dikin him jî tevkariya têkoşina li dijî bişaftinê dikin. Meselen pirtûkeke li ser dîroka Kurdistanê ku bi tirkî hatiye nivîsin xwedî taybetmendiyêke bi vî awayî ye.

Bi me sedemên ji derveyî zimanê bazarê û yê xwepêşanê pir talî û duymîni ne. Tew di gelek nîrxandinan de siyaseta partiyeke kurdî weke sedema bişaftinê tê dîtin lê ya rast mirov li kurdên herî neteweperest binêre, mirov dê di wan de jî zêde zêde bandora zimanê xwepêşanê bibîne. Lewre karakterê sedema modernîteyê ev e. Û ji bo bandorê wê têkoşineke pîralî lazîm e. Divê kurdên dilsoz û dildarên kurdî mējîyê xwe dabeşî parçeyan bikin ku bikaribin ji gelek hêlan ve li hember bişaftinê bisekinin.



Rewşa zarokên êzidî yên ji DAIŞ'ê rizgarbûyî

→ Şaswar Mame

Rêxistina Lêborînê ya Navneteweyî (Amnesty) der barê jin û zarokên ji destên çeteyên DAIŞ'ê hatine rizgarkirin bi ser navê "Mîrateya Terorê: Rewşa Xirab a Zarokên Êzidî Yên Ji DAIŞ'ê Rizgarbûyî" amade kiriye û ragihandiyê. Ev rapor ji 64 rûpelan pêk tê.

Lêkolîna ji bo vê raporê di navbera sibat û tîrmeha 2020'an de hatiye meşandin. Nûnerên rêxistinê, li Herêma Kurdistanê di navbera 17-27'ê sibatê de xebata qadê pêk anîne. Di heyama vê mîsyonê de, nûneran bi malbatan re hevdişî kirine ku li hundir û nêzîkî du kampên ji bo koçberên navxweyî yên navçeya Duhokê dijîn. Hevdişîyên mayî ji bi rêya hevpeyvînan dîr ên bi rêya amrazên dîtarî hatine kirin. Amnestyê bi 29 kesên rizgarbûyî yên ku ji hêla DAIŞ'ê ve wek zarok dîl hatibûn girtin, bi 25 endamên malbatê ku zarokên rizgarbûyî xudan dikin û bi 69 kesên din re hevpeyvî kir. Di nav wan de xebatkarên endamê rêxistinê civaka sîvil ên lokal û navneteweyî, rayedarên Neteweyên Yekbûyî (YE), rayedarên hikûmetê, bijîşk, psikolog û psikoterapistên ku zarokên rizgarbûyî yên ji hêla DAIŞ'ê ve dîlgirtî tedawî kirine û bi wan re xebitîne, hene. Her wisa bi rojnamevan û pisporên ku der barê civaka êzidî de xwedî zanyarî ne û temsîlkarekî olî yê êzidiyan Baba Şêx re ji hevpeyvînan hatiye kirin.

Rapor hem behsa van zarokên êzidî dike yê hatine revandin û ji aliyê DAIŞ'ê ve tev li şer hatine kirin an rastî tundiyan cinsî bûne, hem ji behsa van jin û keçikên êzidî dike ku di encama tundiya cinsî de zarok anîne dinyayê.

Zarokên hatibûn revandin

Li gor raporê, ew zarokên rizgarbûyî piştî ku vegeeriyên malbat û civaka xwe, rastî gelek zehmetiyan hatin. Tenduristiya wan a fizîkî pir xirab bû. Gelek ji wan pirsgerêkên tenduristiya derûnî dijîn, ew carinan bi diyalekta kurdî ya dê û bavên wan diaxivîn nikarin biaxivîn an jî fêhmakin, gelek ji wan nikarin qeyda xwe ya dibistanê çêbikin, piştî windakirina çend salan. Her wiha ew di bidestxistina belgeyên sîvil ên nû an jî di guhertina wan belgeyan de rastî astengiyan tînin ku ew belge li Iraqê pir girîng in, ji bo bidestxistina mafên sereke û sîvîlîngê.

Lêkolîna Rêxistina Lêborînê ya Navneteweyî nişan dide ku rayedarên hikûmeta navendî ya Iraqê û hikûmeta Herêma Kurdistanê ji bo van zarokên rizgarbûyî di garantîkirin û rêzgirtina wan mafan de û di misogerkirina tezmînatê de dikevin nav kêmasiya bicihanîna berpirsiyarên xwe.

Rêxistinê di 7'ê tîrmeha 2020'an de, encamên lêkolînê xwe yê sereke ku bi hûrgilî di vê raporê de derbas dibin, bi nameyan ji serokwezîrê Iraqê, serokê û serokwezîrê Herêma Kurdistanê re şandiye. Ji wan rayedaran xwestiye ku bersivê bidin lê heya 24'ê tîrmeha 2020'an jî tu bersiv nehatine dayîn.



Rêxistina Lêborînê ya Navneteweyî "Amnesty International" raporek li ser jin û zarokên êzidî yên rizgarbûyî belav kir. Di raporê de tê gotin ku jin û zarokên êzidî piştî vegeerê rastî gelek zehmetiyan tînin

Zarokek bi navê Sahir di temenê 15 salî de ku bi zorê ji hêla DAIŞ'ê ve wek leşker hatibû gihandin, piştî der barê serboriya xwe de wiha dibêje: "Ez ê tu carî tişta hatî serê min ji bir nekim. Ew parçeyê min e, wek nişanekê. Ew her tim li vir e. Ew tişta herî xirab e ku bê serê mirovekî, tişta herî bêrûmet e. Dema ez vegeeriyam, tu kesî piştî neda min, tu kesî destê xwe dirêjî min nekir. Tişta ku ez li bendê bûm hema ew bû ku kesek li min xwedî derketa, hinek alîkarî bû, ji min re bigota ku, 'ez li vir im ji bo te.' Yekî destê xwe daniya ser milê min û bigota ku her tişta wê çareser bibe... Ew bû tişta ku ez li bendê bûm lê min ew tu car nedît."

Sahir, leşkerê zarokê DAIŞ'ê

Amnesty radigihîne ku gelek zarokên rizgarbûyî dema vegeeriyên ba malbatên xwe di rewşeke birçîmayî, êşkencekirî de bûn an jî hatibûn mecbûrkirin ku li hember hovîtiyan li ber xwe bidin an jî beşdarî wan hovîtiyan bibin. Di gelek bûyeran de, wan tecrûbeyan li ser tenduristiya wan bandoreke mezîn çêkiribû. Her ku hin zarok bi rewşên ku dikarin bînin tedawîkirin bi şûn de hatibûn wek nexweşiyên bêxwînî û gurîbûnê, yê din xwedî birindariyên lawazker ên demdirêj, nexweşî an jî rewşên giran bûn. Wek encama beşdarbûna nav şer, kurikên ku bi zorê ji hêla DAIŞ'ê ve wek leşker tev li şer hatibûn kirin bi taybetî xwedî rewşên giran ên tenduristiyê û se-qetiya fizîkî bûn, wek windakirina mil û lingên xwe ya di şer de. Keçikên rizgarbûyî yê rastî tecawiz û tundiya cinsî hatine pisgîrêkên tenduristiyê yê xweser dijîn ku di nav wan de trawmaya fistulayî, şûna birînan û dijiwariyên di dema ducaniyê de û zarokanîne de derdikevin holê hene.

Piraniya zarokên rizgarbûyî û xudankerên wan, her wisa gelek xebatkarên karên mirovî dibêjin, pêwîstiyên tenduristiyê yê zarokên rizgarbûyî heya niha neha-

tine pêkanîn, bi taybetî ji pêwîstiyên der barê rewşên tenduristiyê yê dem-dirêj ên giran û rewşên birindariyê.

Bûyera Rayan ku di temenê 15 salî de bi zorê ji hêla DAIŞ'ê ve wek leşker hatibû gihandin, mî-nakeke tîpîk e. Ew dibêje; "Min eniya pêş diparast, ez bi guleyêke topê birindar bûm. Di nav lingê min ê rastê de şarapneleke mezîn heye, li piştî çoka min... Ev şarapnel hema di nav bedena min de maye. Ew bû sê sal ez bi şûn de hatime û tu tedawî nekirine."

Zarokên rizgarbûyî yê ku ji dîlgirtinê vegeeriyane travmayên er-jeng derbas kirine. Hema her xudankerê ku Amnestyê pê re hevpeyvînan kiriyê gotine ku derûniya zarokê ku ew xudan dikin bandor ji dema dîlgirtinê dîtîye. Her ku rewşa her takekesî cuda be ji pisporên derûndirustî hin qalibên hevpar kifş kirine û derxistine holê ku rewşên herî zêde di nav zarokên rizgarbûyî de tînin ên wek nexweşiya zexta piştî travmayê (PTSD), endîşe û depresyon e. Semptom û tevgerên ku ji hêla zarokên rizgarbûyî ve tînin nişandan ên wek hêrsbûn, hiperaktivîte, bibîranîn, kabûsên domdar, bin-şilkirin, xwevekişandina ji rewşên civakî û guherîna ji nişka ve ya rewşa ruhî ye.

Her aktorê karê mirovî ku ji bo vê hevpeyvîne bi wan re hevdişî hatiyê kirin ji Amnestyê re gotiye ku xizmetên psikosoyal û bernamêyên heya yê ji bo zarokên rizgarbûyî yê êzidî bi tîra maf û pêwîstiyên wan zarokan nakin.

"Kurikên êzidî ku bi zorê ji hêla DAIŞ'ê ve kiribûn leşker bi mehan heta bi salan rastî propagandayê giran hatin, hîndariya bîrdozî û leşkerî dîtin, bi zanebûn nasnameya wan a berê, ziman, dîrok, çand û heta navên wan bi wan dan jîbirin. Piştî ku ji dîlgirtinê bi şûn de vegeeriyên, tîkiliya wan a bi endamên malbatê û civakê zehmet bû û carinan digihîşt radeya gefxwarin û acizkirina kurikên din. Ji nivî zêdetir ê 14 zarokên leşker

ên berê ku ji bo vê raporê hevdişî bi wan re çêbû gotin ku wan bi çî şiklî piştîgirî – tu piştîgiriya psikosoyal, tenduristî, aborî an bi awayekî din – nedîtine"

"Keçikên êzidî di dema dîlgirtina ji hêla DAIŞ'ê ve tundiya cinsî ji tê de rastî gelek cureyên destdirêjiyê hatine. Bijîşkek ku ji bo bi sedan jin û keçikên êzidî yê rizgarbûyî alîkariya tîbî dabîn dîke ji Rêxistina Lêborînê ya Navneteweyî re gotiye ku hema hema her keçikên ku temenê wan di navbera 9 û 17 salî de ye ji aliyê wî ve hatine tedawîkirin, rastî tecawizkirin an jî tundiyan din ên cinsî hatine."

Rapor behsa vê yekê dike ku xizmetên heya û bernamêyên ji bo kesên ji tundiya cinsî rizgarbûyî girîngî nedane keçikan; zêdetir bala xwe dane ser jinên rizgarbûyî. Pispor pêşniyaza xizmetên tenduristiyê derûnî û piştîgiriya psikosoyal dikin da ku maf û pêwîstiyên taybet ên wan keçikan bînin çareserkin. Bernamêyên bi vî awayî divê bersivê bidin hemû destdirêjiyên ku wan keçikan di dema dîlgirtinê de jiyane.

Amnesty di beşeke rapora xwe de behsa bandora asimilasyona ser zarokan dike; "Gelek zarokên rizgarbûyî piştî ku vegeeriyên as-tengiyên berbiçav ên zimanî dibînin, ev ji pêşî li wan digire ku bi malbat û civaka xwe re ji nû ve entegre bibin. Her ku hin zarok dikarin bi diyalekta kurmançî ya zimanê kurdî bi awayekî herikbar bi-axivîn ji yê din piştî vegeerî ji dîlgirtinê nikarin bi kurdiya kurmançî biaxivîn û heta nikarin fêhmakin bikin ji. Piraniya wan zarokan niha wek zimanê esasî bi erebî diaxivîn. Aktorên karên mirovî, zarokên rizgarbûyî û xudankerên wan dibêjin, ji bo wan tu derfet tunebûn ku ji wan re bibin alîkar da ku ji wan astengiyên ziman re çareseriyê bibînin û ji wan xilas bibin.

Zarokên rizgarbûyî di gihîna perwerdeyê de rastî astengiyan tînin. Her çiqas gelek zarokên koçberkirî nekaribin xwe bigihînin per-

erdeyê ji êzidiyan rizgarbûyî rastî zehmetiyên taybet tînin, ji ber ku wan yek an jî zêdetir salên dibistanê wînda kirine ji ber rewşa dîlgirtinê. Rayedarên hikûmetê û Rêxistinê Civaka Sîvil (NGO) ên navxweyî û navneteweyî bi rêya bernamêyên hînkirina lezgin hin gav avêtine da ku wan ji nû ve bixin wan pêvajoya sistema perwerdeyê. Gelek zarokên rizgarbûyî, dîsa ji di wan bernamêyan de nehatine qeydkirin, ji ber ku an nizanin ku bernamêyên wiha hene an jî ji ber ku ew ancax bi rêya derbaskirina astên bilind ên burokrasiyê û tijîkirina gelek kaxezan û serlêdana li ba gelek zehmetî hikûmetê dikarin xwe bigihînin wan bernamêyan.

Wek encam, gelek zarokên rizgarbûyî bi temamî li derveyî sistema perwerdeyê dimînin. Dîsa ji li gor çend pisporên derûndirustî yê Amnestyê bi wan re hevpeyvînan kiriyê, berdewamkirina bi dibistanê girîng e ji bo alîkariya bi wan zarokan re da ku trawmaya di dîlgirtinê de rû bi rû mane bikaribin sereker bikin.

Nahla, rizgarbûyî ya 16 salî, girîngiya dibistanê ji bo entegrebûna xwe gotiye: "Piştî ez zivirîm dibistanê, tişt bêtir normal bûn û min xwe baştir his kir. Ji bo pêşerojêkê pêwîstiya me bi dibistanê heye."

Zarokên rizgarbûyî li heman demê tûşî astengiyên berbiçav dibin, di bidestxistina belgeyên fermî yê nû an jî di guhastina wan de, yê wek kartên nasnameyê, kartên niştecîhbûnê û sertîfîkayên jidayikbûnê. Li Iraqê belgeyên bi vî awayî yê bîngêhîn in da ku mirov bikarin mafên mirovî yê sereke bi kar bînin wek azadiya hatin û çûnê û gihîna bi perwerdehiyê. Zarokên rizgarbûyî û kesên xudankerên wan ji Amnestyê re gotine ku pêvajoya bidestxistina wan belgeyan mesrefê dixwaze, dem digire û pêwîst e gelek caran biçin herêmên ku ew ewle nabînin; cihên wek Mûsil û Şengalê.

(Dê bidome)

Teqînê bajar kavi kir



Bi ser krîza mezin a aborî ya gelê Libnanê dijî de, ev teqîna wêranker jî bi ser de hat û barê hikûmeta Libnanê ku di pêvajoya avakirîna de ye girantir kir û her wiha rewşa perîşaniya gelê Libnanê kambaxtir kir

Teqîna mezin a li Beyrûda paytext a Libnanê pêk hat, bû rojê sereke ya hemû medyaya cîhanê. Li ser sedemên vê teqînê ji kêliyên pêşîn ve gelek çîrokên cuda hatin gotin û hê jî lêkolînên der barê sedemên van teqînan de didomin. Yek ji senaryoyên ku herî zêde derketin pêş jî ew teqîn ne ji ber xwe ve lê dibe ku di encama êrişêke Îsraîlê de be, derkete pêş. Lê demêke kurt piştî teqînê dewleta Îsraîlê ku bi salan e li dijî Libnanê operasyonên leşkerî pêk tîne, diyar kir ku tu pêwendîya wan bi teqînan re nîne.

Her wiha tê gotin ku teqîn di nav madeyên ku ji sala 2014'an de hatibûn desteserkirin û li wê bendavê dihatin hiştin de pêk hatiye. Ji aliyekî din ve hate zanîn ku ew madeyên hatibûn desteserkirin amûnyûmnîtrat bû, ew di keştiyekê de hatibû girtin ku barê wê derdora 3 hezar ton amûnyûmnîtrat bû.

Piştî teqînê serokdewlet Mişêl Awn, li gel Komîteya Bilind a Parastinê û serokwezîr Hasan Diab civîneke awarte li dar xist û li welêt şîr ragihand.

Di encama teqînê de zerareke mezin a madî çêbû, her wiha zêdeyî 150 kes canê xwe ji dest da û zêdeyî 5 hezar mirov jî birîndar bûn. Mirov dikare bêje ku teqîn ewqasî mezin bû ku bajarê Beyrûdê tev xistibû bin bandora xwe û hema bêje li bajar devereke ku zirarê nedîtiye nemaye.

Ev teqîn di demêke wiha de pêk hat ku metirsiyên xelkên Libnanê ên di rewşeke aborî ya gelekî zehmet de derbas ne, zêdetir bike. Ji aliyekî ve bêaramiya siyasî û li aliyê din krîza aborî ya li vî welaatî rastî nerazîbûneke mezin a gel dihat di ser de jî wê teqînê rewş kambaxtir kir û zirarên madî û ên gelekî mezin li xelkê libnanî kir.

Bêguman gelek nûçe û senaryoyên cuda ji destpêka wê teqînê ve li ser malperên civakî hatin belavkirin lê di rastiya xwe de tiştê ku heta niha bêşik û bêguman tê aşkerkirin ew e ku teqîn bi sedema madeya amûnyûmnîtrat bû a ji sala 2014'an ve li wir tê hiştin.

Her wiha tiştêkî din jî ê bêşik û bêguman heye ku ew teqîn di en-

cama sersarî û gendeliya berpîrsên hikûmetê de pêk hatiye, ji ber ku li gorî daxuyaniya berpîrsê bendergehê gelek caran wan der barê talûkeya hiştina wan madeyan de berpîrsên hikûmetê hişyar kirine lê kesekî bersiv nedaye berpîrsê bendergehê.

Lêpîrsîn didome

Di çarçoveya lêpîrsîn û lêkolînê der barê sedema van teqînan de heta niha 16 karmendên bendergehê tevî serokê wê Hesên Qirêtim hatine binçavkirin û lêpîrsîna wan berdewam e. Her wiha der barê hin berpîrsên din de jî biryara qedexeya derketina derveyî welaatî hatiye dayîn.

Nerazîbûnên ji Hizbullahê

Ji aliyekî din ve hêrsa gel a li dijî Hizbullah libnanî jî zêde dibe ji ber ku li gorî agahiyên ew bendergeh di pratîkê de di bin kontrola Hizbullahê de bû û hilanîna wê madeya talûke bi salan li wê devera nêzî cihê sivîlan bû sedema nerazîbûnên mezin. Di vê derbarê de gotarek ji aliyê Selman Doserî ve hatiye nivîsîn tê de wiha

dibêje: “Gelê Libnanê piştî wê teqînê naskirin ku Hizbullahê ew madeya talûke ne li nêzî sînoren Îsraîlê lê di nav sivîlan de bi cih kiriye û ew ne ji bo rizgariya Qudsê lê ji bo darbeyekê li aramiya Libnanê bixe hatiye bikaranîn. Nivîskar di berdewama nivîsa xwe de dibêje: “Çareserî ne bi riya avakirina lijneyê navneteweyî pêkan e lê ew bi riya lêpîrsînekê bi Hizbullah û hemû partiyên girêdayî wê re pêkan e. Divê pençesêr ji hundir ve were dermankirin ne ji derve de.”

Piştigiriya navneteweyî

Her wiha rêveberên gelek welaatan ve peyamên piştigiriyê ji bo gelê Libnanê hatin şandin. Piştigiriya herî berbiçav jî serdana serokê Fransayê Emmanuel Makron bû. Makron di serdana xwe ya Libnanê de bi rayedarên dewletê re hevdiştin kir û da xuyakirin ku ew dê bi tevlehûna Yekitiya Ewropa û Amerîkayê û bi alîkariya bankaya navneteweyî konferansekê ji bo alîkariya Libnanê li dar bixin. **BEYRÛD**



Rêkeftina petrolê bi piştewaniya Washingtonê ye

Navenda Nûçeyan

Li gorî çavkaniyên herêmi Rêveberiya Xweser li gel Kompanyaya Delta Crescent Energy a di warê petrolê ya Amerîkayê de rêkeftinek îmze kiriye û ew gav jî bi agahdarî û piştewaniya Washingtonê bûye.

Li gorî heman çavkaniyê, rêkeftin ji bo 25 salan e û egera dirêjkirina wê jî heye. Li gorî rêkeftinê, kompanya amerîkî dikare berhemaniyê li birên petrolê yê rojavayê Kurdistanê û navçeyên di bin kontrola Rêveberiya Xweser de zêde bike û petrolê jî bifroşe.

Tê payîn ku wê ev yek bandoreke baş û erênî li ser aboriya deverê bike. Her wiha ev rêkeftin jî alî siyasî, dîplomasiyê û leşkerî ve xwedî bandoreke baş e ji bo herême.

Ji hêla aborî wêdetir jî ber ku rêkeftineke wiha ji bo Rêveberiya Xweser rê li ber têkiliyên xurtir ên sîyasî û dîplomasiyê vedike lewre ew rêkeftin jî alî rejîma Sûriyê û dewleta tirk ve rastî nerazîbûnên tund hatin.

Her wiha girîngiyeke din a wê rêkeftinê ew e ku ev yek nişan dide, ev herêmi li derveyî ambargoyên Amerîkayê dimîne û sîza û ambargoyên Qeyser ên Amerîkayê yê li ser Sûriyeyê ferz kiriye, bandora xwe li wê herême nake.



Li Tûnûsê krîza ji ber Îxwanan

Di demêke de ku hewldanên ji bo avakirina hikûmeta Tûnûsê didomin de, di navbera partiyên siyasî de krîza nerazîbûna ji partiya Nehda ya Îxwanan kûr dibe. Seroka partiya Destûrî ya Azad Ebîr Mûsa da xuyakirin ku partiya wan dê cih di hikûmetê de negire ku partiya Îxwanan Nehda di nav wê hikûmetê de be. Mûsa di daxuyaniya ku li ser malpera xwe ya medyaya civakî de parvekir wiha gotiye: “Em tev li tu şewîr û hevdiştinên ji bo avakirina hikûmetê nû nabin, heke di nav wan endamên partiya Îxwanan Mislimînê hebe.”

Her wiha rexneyên tund li hikûmeta Nehda ya Îxwanan û serokê wê Raşîd El Xenûşî kir ku ji sala 2011'an ve desthilatiya welaat xistiye bin kontrola xwe. Her wiha serokê partiya Tevgera Gel a Eniya Demokratîk Zuhêr Mexzawî jî di hevdiştinên ji bo avakirina hikûmetê nû de anî ziman ku ew alîgirê wê yekê ne ku partiya Nehda li derveyî wê hevgirtinê were hiştin û hikûmetê bîyî Nehdayê were avakirin. **TÛNÛS**

Rola hêzên derve di şerê li Lîbyayê de

Navenda Nûçeyan

Bi destwerdana hêzên derve ya li kar û barên Lîbyayê de her diçe aloziya li vî welaatî kûrtir dibe. Bi taybetî di dema dawî de nakokiyên



di navbera Tirkiye û Misrê de rê dide ku ev şer veguhere şerekî rasterast di navbera wan her du welaatan de. Piştî ku parlamentoya Misrê jî rê da ku leşkerên wê dikarin biçin Lîbyayê, hikûmeta Enqereyê jî alîkariya xwe ya leşkerî li

vî welaatî zêde kir da ku hikûmeta Wifaq a Îxwanan Mislimîn bikaribe li hemberî artêşa Niştîmanî ya Lîbyayê bisekine.

Ji sala 2014'an ve komên çekdar bi piştigiriya hêzên siyasî ên dixwazin desthilatdariya vî welaatî bixin bin kontrola xwe aliyên siyasî di nav şer û pevçûnan de ne.

Aliyê hikûmeta Wifaq jî alî hikûmeta tirk û Qeterê ve tîn destekirin her wiha aliyê artêşa Niştîmanî ya Lîbyayê bi serokatiya Xelîfe Hefter jî alî Rûsya û Misrê ve tîn destekirin. Her aliyek jî van aliyan yê din tewambar dibe û dibêje ku ew çekdarên biyanî û komên çete derbasî Lîbyayê dikin.

Hin welaat jî wekî Amerîkayê di wê navberê de diçin û tîn. Amerîkayê jî aliyekî ve heta demêke nêzî piştigiriya Hefter dikir lê dema ku mijar bû destwerdana Rûsya yê çavên xwe ji alîkariya hikûmeta tirk a li dijî Hefter re girt.

Aborî û Civak

Ramazan Tunç



Zembîlfiroş, Parîteya Hêza Standinê (PPP) û Piyaseya Zêr

Di dîroka aboriyê de, nivîskar-wêjekarên bi nav û deng ên wek Mark Twain di jiyana xwe ya rojane de ji behskirina rewşa aboriyê û borsayê kêmanemane. Mînak, Twain dibêje, di meha cotmehê de di piyaseya senedên parê de kirariyan nekin. Ji ber ku wêjekar, nivîskar, helbestvan, feylesof di nav civakê de ne, jiyana wan jî parçeyekî ji jiyana civakê dide nîşandan. Di nivîsên wan de kodên civakî ku girêdayî debar û aboriya wan in, gelekî zede ne. Di dîroka aboriya kurdan de Zembîlfiroş çirokeke welatîyekî kurd e ku mirov dikare di nav vê çirokê de gelek kodên civakî yê der barê aboriyê de jî jê bigire. Bi ya min rewşa Zembîlfiroş û xatûna mîr di heman demê de wek berhemên bi nav û deng ên klasik Madam Bovary a Gustave Flaubert, Porteya Dorian Gray a Oscar Wild, Anna Karanîna ya Lev Tolstoy ku di dema hatine nivîsandin de, hem ji ber rewşa wê demê nîşan didin hem jî di rengê wêrekiya jinê de meydanê ji exlaqê rûniştî yê civakê re dixwazin, xwediyê girîngiyeke zêde ne. Di warê dîroka çand û wêjeyê de ez naxwazim di ser gotinên wêjekar, helbestvan û nivîskarên hêja yê Wêjeya Kurdî ya Nûjen ên wek birêz Kawa Nemir, Selîm Temo û Şener Ozmen de gotinekê bibêjim lê ez pêwîst dibînim ku hinekî li ser kodên aborî yê di çiroka Zembîlfiroş de derbas dibin, behsa piyaseya kurdan a hêza standinê ku îro di pergala navneteweyî de wek Parîteya Hêza Standinê (PPP-PHS) û Katjimêra Gini bikim ku di heman demê de li ser hêza standinê û dahata kesan di sekine.

Zembîlfiroş ji bo debara xwe, zembîlan çêdike û difiroşe. Di nav kolan û çarşiya Farqînê de bazareke ku zembîlên xwe bifiroşe nabîne û her kes berê wî dide taxa mîr ku sembola hêza standinê ye. Gelo ji bo çî berê wî didin taxa mala mîr? Dahat an jî bazarên taxan li gor çî dihatin diyarkirin? Bandora mîr li ser bazarê çî bû? Wek ku Keynes gotiye, ji bo hevsenga bazarê pêk bîne, mîr bi hêza xwe ya standinê mudaxaleyî kîjan piya-



seyan dikir? An jî buhayê zembîl û yan jî tiştan, tiştên dihatin firotin bi çî awayî diyar dibûn ku Gulxatûn ji Zembîlfiroş re pêşniyaz dike ku Zembîlan "buha buha jê bistîne"? Ji bo çî Zembîlfiroş wek pêşniyazên Adam Smith ku dibêje bila mudaxaleya tu kesî li piyaseyê nebe, piyase bixwe hevsengiyê pêk tîne û dibêje "laissez faire laissez passer- (dev jê berdin) bila bikin bila derbas bibin", dibêje "bazar min malê helal e"? A girîng jî ew e ku Gulxatûn ji bo rojekê bi Zembîlfiroş re derbas bike, xîşrên xwe (zêr û zîv) ziha dike. Nirx û qîmeta zêr li gor çî ew qas zêde bûye? Hêza rêveberiyê bi çî awayî dahat belav kiriye ku hêza standinê gel biparêze? Mirov dikare van pirsan zêde û berfireh bike.

Em ji nav rûpelên dîrokê derkevin, werin van rojan û pirsan herî giran bikin.

Gelo ji bo çî li hinek taxên Tirkiyeyê dahata serê kesê zêde ye û Katjimêra Gini bi hevsengî belav bûye? Mînak, herêmên Marmara û Egeyê û li hinek taxan jî dahata serê kesan pir kêmanemane, mînak herêmên bakurê Kurdistanê? Çî amûran ev hevsengî xera û ava kiriye?

A niha jî ev niqaşên der barê bazar û piyaseyan de gelek zêde ne. Hêzên dewletan ji bo çî mudaxaleyî piyaseyê dikin, a niha bi zordarî pêşiyê li zêdebûna nirxê malên wek zêr digirin? Di hevsengiya piyaseyan de bi awayekî hem dewlet hem jî piyase bi serê xwe nikarin hevsengî biparêzin. Dîtaneya îktisada modern ji bo van pirsan bibersivîne, gelek xebat û lêkolînan dike. Niha bersivdayîna van pirsan gelekî zehmet e û astengî hene. Ji bo piyaseyan li ser piyan bihêlin bi milyar dolaran pere bi destê dewletan xistin piyaseyê û nirxên gelek pereyan daket lê tiştê heye ku nirxê wî di her demê de xwe parastîye. Ew jî zêr e. Ji ber vî awayî a niha li hemû cihanê nediyariyê hevsengiya piyaseyan xera kiriye û her roj piyaseya zêr radike û pereyên heya li hemberî zêr nix wenda dikin. Nedyarî û qeyranên navneteweyî edelata dahatê xera dikin. Dewlemend zêdetir dewlemend dibin û feqîr zêdetir belengaz dibin ku di piyaseyan de Katjimêra Gini zêdetir bilind dibe. Ev jî sedî sed girêdayî politikayên hikûmetan e lê dîsa jî hikûmetên serdema kadîbûnê (globalîzmê) ji tofana qeyranên ji herêmên din belavî piyaseyan dibin, xwe xelas nakin. Li hemû cihanê nirxê zêr jî ber tevlihevî û nediyariyê zêde dibe lê li Tirkiyeyê jî bi du awayan nirxê zêr zêde dibe. Yek, di piyaseya zêr de li hemû cihanê onsa zêr zêde dibe û jî ber ku nirxê ons gîredayî nirxê dolarê amerîkî ye jî roj bi roj nirxê pereyê tirkî li hemberî pereyê amerîkî serberjêr diçe. Du, mudaxaleya dewletê jî, bi zêr û dolarê amerîkî çareseriyê nayîne. Ji ber ku li piyaseya Tirkiyeyê a niha hem dîtaneya têkçûyîna piyaseyê hem jî têkçûna dewletê heye buhayên mal û tiştan naselihe. Politikayên wezaretê darayî û banqeya navendî tîra pêdiviyên piyaseyan nakin û jî vî rewşê dîr in. Bi tenê pesnê xwe didin û dixwazin bi manipulasyonan ser têkçûyîna dewletê û têkçûyîna piyaseyê binixêmin.

Em werin rewşa Zembîlfiroş û Gulxatûnê; ji ber ku piyase carinan xera dibe û

rîskên bingehîn zêde dibin, zêr û zîv wek bendergehên (lîman) herî biewle ne ku hêza standinê ji bo kesan diparêzin. Çiqas di sektora zembîlan de kar nemîne jî pêwîstî bi hêzekê heye ku hevsengiya piyaseyê pêk bîne. Hebûna xîşir her tim hêza standinê diparêze. A niha jî ev rêbaz derbasdar e. Hêz û wêrekiya Gulxatûnê ji berhevkirana zêr e. Ji ber ku zêr bandorê li buhayê pereyên di piyaseyê de dike. Wek a niha ku li hemû cihanê fonên mezin, banqeyên navendî, sermiyandarên mezin, hebûna xwe wek Gulxatûna Zembîlfiroş di zêr de berhev dikin. Stratejiya ji bo berhemkaran jî stratejiya Gulxatûnê ye ku bi hêza standinê digihîje amanca xwe. Wisa xuya ye ku di piyaseya zêr hinekî din jî bandorê li piyaseyên din bike. Di piyaseyan de fonên mezin û hilberînerên mezin jî vî rabûna zêr zêdetir sîdê werdigirin. Di şiklê jêr de buhayê zêr ji salên 1970'yî heta niha ku çawa guheriyê û di pênc salên dawî de rêyek çawa di meşe xuya dibe. Rabûna zêr didome lê PPP û Gini jî li wê gorê diguherin. Bazara Zembîlfiroş bazara malê helal e (hevsengî) lê mudaxaleya Gulxatûnê hevsengiya bazarê xera dike. Di piyaseya Tirkiyeyê de jî, êdî ev hevîr avê nagire lê dîsa jî sêva çê para hirçê ye.



Dîtaneya Têkçûna Piyaseyê (Market Failure):

Di zimanê piyaseyê de ji bo rewşa ku qabiliyeta piyaseyê ya bi tena serê xwe hevsengiyê pêk bîne tune be, tê gotin. Dinamikên piyaseyê bi tenê nikarin hevsengiyê rast bikin.

Dîtaneya Têkçûna Dewletê (State Failure):

Di zimanê piyaseyê de ji bo rewşa ku qabiliyeta dewletê ya bi tena serê xwe nikaribe hevsengiyê pêk bîne, tê gotin. Bi amûrên destê dewletê bi tenê, hevsengî rast nebe.

Piyaseya Zêr: Piyaseya dan û standina zêr e. Navenda piyaseya zêr Borsaya Londonê ya Zêr e. Di sala 1919'an de hatiye damezrandin. Ji sala 1850'yî şûn de bi destê malabatên/fonên mezin "N.M. Rothschild & Sons, Mocatta & Goldsmid, Pixley & Abell, Samuel Montagu & Co. and Sharps Wilkins" ev piyase tê birêvebirin. Sêvên çê para hirçê: Ji bo kesên hêza wan zêde ye û destên wan digihîje her deverî tê bikaranîn. Di piyaseya hirçê de senedên parê dadikevin û fonên mezin (hirç) jî carinan di vî daketîna de karên mezin dikin. Zêr ji bo berhemkariya mal û amûrên berhemkariyê baş e lê dîsa jî ji bo kesên sermiyanê wan zêde ye, sêva baş para hirçê ye; berhemên baş para sermiyandaran in.



Velgê dare ruçikit kerd çuwalan

Mehmet Seyîtalioğlu

Hawtanê derbaz biyayeyan de ma qalê Siltan Silemanî kerdî. Tilya ey de ju gîştanêestbiyo hûrînda nêxşê gîştanî de morê ey biyo. Cebrailî no mor dayo Siltan Silemanî. Sîya nê morî ra dinya Silemanî ver de eşkêra biya.

Xoce Belqîya ra vano bê ma şîme lewê Şayh maran cira caye dare bimusîmepelganê a dare biçîme binê linganê xo ra kîme, awika deryayo sero xij bîme şîme. Morê Siltan Silemanî maxara de bivînîme, biçîme. O mor ke ma girewt, a taw beşê keno ke hukmê ter û turî bikerî. Mi ke hukmê ter û turî kerd, beşe keno ke cayê peyxamberê axir zamanî kî bimusi. Ebe na qeyde ti şonî cemelê peyxamberê axir zamanî vînênî. Zekê xoce nay vano Belqîya qan beno. Belqîya keweno ra xocî dima. Kewenê raye yenê mekanê mi de vecînê.

Belqîya raye ra xocî dano sondîro. Dano sondîro ke, Şayh Maran rê xirabiye mekero. Xoce wad keno û mi rê tawa mekero. Kewenê raye yenê mekanê mi de vecînê. Seymur Xoce zaf şeytano. Kupe şit kupe kî awik hengura sûre keno pir. Ano baxçê mi de nano ro. Bi xo kî û Belqîyayî kî şonê pey dare de xo darênê we. Çîme mi ke gina kupe ra mereq gina zerrê mi ra. Şîyo serê kupe kerd ya, juyêde şit esto, a kupa binê de kî çiyode sîr esto. Ezo bêaqil nêfsê mi mecal nêda mi ke xo rê wayîr vejî. Şîyo mi a awika sûre kerde xo serde. Kerde xo serde ke tişşoriya. Hîre mi şî ez gino waro. Gino zerrê kupî ro. A sate xoce ame qapaxê kupe mi sero qapan kerde. Mi çîmê xo kerdî ya ke, ez zerrê kupe de hepiso. Mî zerrê kupe ra veng da vake; Xocî vake:

-Ti qet meterse Şayhê mi, ma bi çîye fetelîme. Ma ke a dare doz kerd, to onciya pey ser

anîme. To welatê to de ca verdanîme. Mi reyna pers kerd.

-Şîma çiko, çi wazenê, çi gêrenê?

Xocî vat ke;

-Care na dinya de dare esta. Ma a dara cisnê ro fetelînîme. Wazenê ke a dare bivînîme. Pelge a dare awika aye binê linganê xo rakerî hawt deryayan sero ravêrî şorî morê Siltan Silemanî xo dest finê. Aye ra to tey benîme. Ma ke a dare dîye, ancîya to anîme welatê to de to raverdanîme ra.

Mi zana ke peynîya nê lawatişî çin a. Xo rê endî vengê xo nêvet. İno ez tey berdo fetelno. Kotîra ke werdîme ra uca de velg û vaşî amay ra zon, qesî kerd. Kamcî dare, kamcî vaş seni derdîrê demano jube juamêyra zon. Ju vaşî vat ke;

-Awika mi bişîme nêweş nêbenê, kokim nêbenê. Hatanî qîyameti weş û war manenî.

Hama nînan goş nêkut pira. İnan waştene ke tenya a dare bivînê. Aye ra kî velg û vaşan ra çîye pênehesîyay. Ez ebe no tore çewres roje birr û tirra a ez fetelno. Axirî peynîye de raştê a dare ameyîme. Dare amey zon. Vat ke;

-Kam ke velgê mi ra awik veyeno, keno binê linganê xo ra o, deryayan sero xij beno şono. Nêgineno awikro.

Xocî heybetenê xo ra, şa biyayişê xora nêzana ke se bikero. Desinde velgê dare ruçikit kerd çuwalan, Çuwalî pir kerdî. Bado kî mi ra vat ke;

-Endî karê ma to de qêdiya. To verdanîme ra. İta de.

Mi kî vat ke;

-Madem ke şîma mi verdanê ra. Qet nêbi ke hetanî welatê mi mi berê ke, tenê kî xêrê şîma mi bireso.

Na xebêrê ser o, ez berdo nêzdiye welatî mi de verdaya ra. Se ke qapaxê kupe kerd ra, mi vilê xo vet teber. Kupe ra vejîyo, çîra ke vejîyo ke bivînî, çi bivînî o ju, oyo ke lewê xocîder o Bel-

kîyayo. A waxt mi zana ke qulê di lingî ra tim bebextîye û ci re îtîbar nêbeno. Oncîya kî cêro ra ci ra vat ke;

-Şîma bêrê na sewda ra waz bêrê, na sevda ra bitexêlîye. More Siltan Silemanî şîma re xêr nîyano. O mor şîma rê nêşîb nîyo. Şîma gune yê. Xortîna xo telef mekerê. Seyrkerê kema kotîro fetelyayîme, kotî ra şîme honday velg û vaşî dar û berî amay bizan. Derdan rê dermanê xo vatî. Şîma qet goş nênasar. İno vat ke;

-Nê.

Naye ser xocî û Belqîyayez ardo nêzdiye welatê mi de verday ra, ginay raye şî.

Na qesîye ser çixake mi se va qet goş nênay mi ser.

Na qese kerdene ra tepîya Cemşîti Şayh Maran ra vat ke;

-Ya Şayhê mi, na qesê kerdene dege ra tepîya Şayh maran ra pers kerd. Vat;

-Ya Şayhê mi, nê şî morê Siltan Silemanî girewto, ya nêgirewto?

Şayh maran vat ke;

-Nînanvelgê daran kerd binê linganê xo ra. Deryayan sero xij bî şî. Zaf şî, kemî şî cêverêde mixare de vejîyay. Seyr kerdî ke der û dormê xo gul û kulfilko. Her ca ra boya misk û amberî yena. Xocî kitabê xo kerd ya. Dua îsmê azamî wend. Kewt zere. Waxto ke ame gîştane bêçîka Siltan Silemanî ra bo vejo. Ejderya vejîya fekê xo ra kilê puf kerde hetê xocî ser. Xocî dua wende kila ejderyayî tede kar nêkerde. Cenabê Haqî onciya cêbrail ruşna. Vake;

-Şo vîrnîya kuye. Xoce, morê Siltan Silemanî mecêro. Wa nêfîno xo dest.

Cebraîl ame zirça pa ra. A waxt xocî dua îsmê azamî xo vîr ra kerde. Xo vîr ra ke kerde. Kila ejderyayî ginê can û ruhê xocî ro, xoce veşa bî welle. Belqîyayî pey ser vazda, Pey ser vaz da ame û xelesiya ra. Seyr ke Belqîyayî rîyê, cemelê peyxamberê

axir zamanî nêdî. Çito ke ti şorî dinya roştîye bivînî. Bê na dewe ra ravîre. Bitexelîye. Cemşit kî tenê fikirîya, reyna pers kerd. Vat ma Belqîya se bî?

Şayh Maran vat ke;

-Belqîyayî velg onciya kerd binê linganê xo ra. Da pira uca ra durî şî. Ame merge de vejîya. A merge de hênîyode girs estbî. Bî tarî. Muxurbe ke kewt, uca de meredîya ra. Tey hewn ra şî. Tenê ke mend heşîya xo seyr kerd ke tay mar û milawînî vecîyayî. Tersanê xo ver, vejîya gilê dare. Vejîya gilê dare de xo dard we. Mar û milawînî a merge de kom bî. Hergo juye ju almost binê gulya xora wet. Lewê xo de naye ro. Dormê inan bî roştî. A roştîya almanan de merge de çerdî. Sekê sipî eşt, lele şodîrî bî ya, mar û milawînî aqetîyay almastê xo day arê. Kerdî binê gulya xo bî vîndî şî.

Belqîya kî darera ame war.

Dest û rîye xo şufî. Terkit şî koyî de vejîya. Belqîya seba na qesa hîris sey serr ra fetelîya. Kincî kolî pa nê mendî. Bastona asnêne helîyaye, solê xo piştê palê xo sero nêmend bî. O hona kî fetelîno. O hewt deryayan ser ra verd ra şî. Şî sîndorê iklimê Kalsimî de İtiwatolî welatê hûrîyan de vejîya. Xelî keşî raştê ju baxçey ame. Ey baxçey de hazar û ju awnîya meywî estbî. Çîmê xo ginara saye. Xo xode vat 'na saye cira kerî borî'. Seke destê xo kerd derg saye amey ra zon. Vat ke;


-Saya mi cira meke. Axirî ti kî cisnê ademcay ra nîyî! Ma pîlê şîma heqû talay cennê ra tewer nêkerdî. Meyweyanê mi ancax Hurîyî kenê cira wenê, şîma nê. Belqîya şaş bî mend. Ucara ke tenê şî. Raştê ju hûrîye ame. Selam da. Va;

-Ma bixêyr dî. Hurîye vat;

-Ma bixer dî. Benî adem. O çi tonu ti kewtî ci. O çi şufêti o. Belqîyayî pers kerd.

Na çîroke ma tiya de caverdîme. Hetanî yewna hawte bîmanê weşîye de.

Dewey Ma



Cemil Oguz

cemilo@diyamame.com

Cavî Murtazaoglu tiya ra şî

Henî merdimî estê ti nas bikerê zî, nêkerê zî xebera xirabe a sere inan de merdimî xemgîn kena. Xebera serê hunermend Cavî Murtazaoglu de zî bi eno awa ya.

Ma vernî de bawrin ew kam o? Cavî Murtazaoglu İnan ra bî. O Tebrîzê İranî de hamew dinya, ewca dest bi karê muzikî kerdo. Wexto hema çîckeko babê xo Alî Murtezadir şîno Cemxaneyan û cem vîrazeno. Wexto babê cê mireno 14 serrîyo û hendî barê cemî û muzikê eleqedarê cemî kuno serê milê ê. O enî karî dewam keno. Dima ra serey 1993 de şîno Baku konser-vatûar waneno. Bi ene game ra keye zî berdo ewca û demêk ewca mendo. Murtazaoglu dima ra serey 1997 de ageyreno Tebrîzê İranî û xebatanê xo ê serê muzikî dewam keno. Şîiran zî nisneno. Bi namey "101 nefes" kitabêkey şîiran veceno. Tebrîz de rewşê ê zehf baş nîyo la reyna zî Sendikay Hunermendanê Azerbaycanî vîrazeno. Polîsî erzenê serê sendika û kenê vila. O zî xo mehkema de vînenê ke mehkema ê bi "serey merdiman dano tîmîyan ro û merdiman qeybî serhildanî keno ra serê lingan" suçdar kena.

Hetêke ro zehmetî vernî de yê, heto bin ro o xebatanê xo yê muzikî dewam keno û albuman vîrazeno. La xeynî muzikî serê felsefî de zî xebeteno û serê felsefî de niştan nisneno.

Wexto hendî imkanê mendîşî yê İnan de nêmoneno, serey 2002'yanan de verê xo dano Stenbolê Tîrkiya û ewca ca beno. Tiya bi namey "Ses Atolyesi" (Atolyeya Veng) keno a û dersan dano, xebatanê muzikî dewam keno. Stenbol de bi xebatkaranê Navenda Çanda Mezopotamya (NÇM) dir zî kar keno. Henî hunermendê NÇM'î dersey vengî te ra gîne. Ê komey Kardeş Turkulerdîr zî kar kerd û solîstey kome Fer-yal Oneydir album vet.

Murtazaoglu ke Zanîngehyey Beykentî de dersey şan-solfezî zî da, di atolyeyan de zî dersey şanî da zehfê hunermendan.

Di jîyaney xo de se heb zêdeyêrî bestey viraştî. Di hebî operetî bi namey "O 3 (Leyla-Mecnûn)" û "Pîr Sultan" viraştî.

Hikayeya penaberî zî balkêş a. Dimay ke Stenbol de 11 serê cê derbas benê, di TRT de bernamey muzikî vîrazeno, zehf cayan de konseran dano, di serey 2013'yanan de qeybî karê rûniştîşê fermî şîno Emniyetê Stenbolî, Emniyet destûr nêdano ê û vano "Ti gere 15 rocan de Stenbol terk bikerê." O şaş beno, nêzano se bikero. Emniyet vano "Ti gere şorê Bolu". Mecbûr maneno o û malbatay xo şorê Bolu la terso ke ê teslîmê İnanê bikere zî esto. Hunermendê muxalîfî ê kurd û tîrkî kunê meydan, qeybî ê kampanyayan danê dest pa kerdişî...

Cavî Murtazaoglu ke vengê xo zehf weş û serkewte bikar ardê ne Tîrkiya de projeya bi namey "Tebrîz ra Heta Toros" viraşt, reyna albumê zey "Virtuozler ve Cavî Murtazaoglu" vet. Di albumê hunermenda kurd Gulbahar Kavcu "Sebep" de hem aranjorî keno hem bi vengê xo rih da dêrêke.

Ê Tîrkiya de bi namey "Ses Metodu" hîrê cîldî kitabî vetî ke enî kitabî dinya de yewîn kitabê ke serê metodê vengê insanî de hamey niştîşî.

Enka mi çi rê qalê ê kerd? Cavî Murtazaoglu 10'ê menga şî de bi nêweşî vîrusê korona kuno û dimay çende rocan rewşê ê beno giran û 6'ê tebaxe 2020'in de wefat keno.

Mi bi xo zî NÇM de ci vîna bî û ma sohbet kerd bî. Ez şîbiya çende konseranê ê zî. Ew zey karê xo merdimê ke nazik bî. Dinya merdimê ke bîn ê nazik kerd vîni.



Du çîrokên kurt



Ev çîrok di salên (1801-1894) ji alî Mele Mehmûdê Bazîdî ve ji zîmanê farisî hatine wergerandin û bi xeta destan hatine nivîsîn. Ew beş ji 84 çîrokên kurt pêk tê. Ev çîrok di koleksiyona Aleksandre Jaba ya destnivîsên kurdî de cih digire. Min li vir du çîrok ji wan bi zîmanekî rojane wergerandine da ku baştir werin fêmkirin.

Du mirov malê xwe dispêrin pîrejînekê û dibêjin kengî em ji seferê vejeriyan û her du bi hev re hatin tu yê malê me bidî me. Piştî demekê yek ji wan tê û ji pîrê re dibêje: Hevalê min çû ber dîlovaniya xwe û ez hatime wî malê me spartibû te bibim. Pîrê malê ku emanetî wê kiribû dide mêrik. Piştî demekê ew hevalê wî tê ba pîrê û dibêje ka malê me spartibû te.

Pîrê dibêje hevalê te hat û got ew miriye loma min mal sparte hevalê te. Zilam dibêje lê me got ku em bi hev re neyên tu nadî kesî. Pîrê dibêje lê wî got hevalê min miriye. Zilam û pîrê diçin ba dadger. Piştî ku dadger çîroka wan dibihîze û bawer dibe ku bi rastî pîrê malê wan spartîye hevalê wî ji mêrik re wiha dibêje: Te gotibû ku em ne bi hev re werin divê tu malê me nedî.

De vêca biçe hevalê xwe bîne û her du bi hev re werin da ku pîrê malê we bide we. Bi gotîneke din a zelaltir tu biçe hevalê xwe bibîne û malê xwe jê bistîne.

Di nav wan çîrokan de, çîrokek din jî li ser teslîmkirina emanetê hatiye nivîsandin ew jî wiha ye: Carekê jî melayekî hinek perê xwe spartibû dikandarekî. Piştî demeke dirêj rojekê mela tê pereyê xwe dixwaze lê dikandar dibêje qet tişt-yekî wiha tune ye û te perê xwe ne spartîye min.

Mele diçe ba dadger û hal û meseleya xwe û dikandar re dibêje. Dadger ji mela re dibêje: Tu biçe 3 rojan li ber dikana wî rûnê û qet dengê xwe neke. Roja çaremîn ez ê di wir re derbas bibim û silavê bidim te. Mela diçe li ber dikana deyndarê xwe rûdîne û qet tiştêkî jê re nabêje. Roja çaremîn dadger tevî parêzvanên xwe di wê derê re derbas dibin û silavê dide mela. Mele bersiva silava wî dide, dadger dibêje: Tu çima qet bi ser min de nayêyî, ka rojekê were hal û derdên xwe ji min re bêje.

Dema ku dadger wiha dibêje, dikandar gelekî ditirse û diçe ba mele jê re dibêje: Heyra ka bîne bîra min te kengî û çawa ew pere dabû min dibe ku min ji bîr kiribe. Mele dibêje min wiha ew pereyên xwe teslîmî te kiribûn. Dikandar dibêje: Ha belê rast e niha hat bîra min û pîre pîre pereyê mele lê vedigerîne.

Dildarê Amedê



Te got Hirç?

Weloyê Sinî. Sinê girêdayî navçeya Licê ya Amedê ye.

Rojekê Welo wekî her rojê li ber pez e. Pezê xwe li çiyayê piştî Sinê diçêrine. Çiyayê Sinê çiyayekî pir asê ye. Di neqebeke teng de ew û hirçê derdikevin pêşberî hev. Ne Welo dikare paşve here û ne jî hirç paşve gav diavêje. Welo zilamekî jêhatî ye. Di herêma xwe de gelekî bi nav û deng e. Yek ji Welo û yek ji hirçî. Welhasil pev diçin. Welo hirçî di kuje lê ew jî nivkuştî dibe. Gundî bi vê bûyerê dihesin û bi hawara Welo de tîn. Welo bi lez tînin gund. Di canê Welo de bi qasê serê derziyê cihêkî bê birîn nemaye. Welo derman dikin û dixin nav nivînan. Welo piştî heyvekê tê ser hişê xwe.

Gundî tîn serdana wî û jê re dibêjin: De behsa şerê xwe û hirçî bike lê ji ber ku perda guhên Welo qet-

yaye, deng baş naçê.

Dibêje dengê xwe bilind bikin û dibêje: Xwedê mirovan ji hîrn biparêze. Bêxwediyê tu dibêjî qey xwariye û neriye. Hûn nizanin ku destê wî çiqas giran e. Wexta ku şîqam li binê gihê min dixist xwedê jî dizane ku min her carê deh stêrk bi hev re dihejmartin. De îca çiqas bihd dida? Te digot qey îsal serê heft salan e ku serê xwe neşûstîye.

Welo ji gundiyan re dibêje temîniya min li we be heke ku we li cihêkî hirç dit riya xwe biguherînin bila mêranî ji wî re be. Piştî vê bûyerê li gund di şevbêrkan de kê çî bigota. Welo digot qey behsa hirçan dikin û di cih de bersiva wan dida û digot: Hirç se-walekî pir xedar e; Xwedê hîvza mirovan jê bike û mirovan jê biparêze. Ma ne bê sebeb jê re gotine hirç!

Rîza Uyar

XAÇEPIRS

1		2		3		4
			5			
6						
			7		8	
9	10		11			
			12		13	
14						
		15	16			
17						18
		20		21		
		22		23		

JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ

- Milk û hebûnên mirov
- Serokeşîr, xwediyê gund
- Meheke biharê
- Vala, an jî bê kes û kûs
- Beşeke xaniyê malê
- Kesê ku mêşên hingiv xwedî dîke
- Dest vekirî, ne çikûz, ne tima
- Kesê ku demeke dirêj avê vexwaribe
- Strana ku bi dengê Şefîqê Tembûrvan gelekî bi nav û deng bû
- Dirb, cihê pêveçûnê
- Notayêke muzîkê
- Jiyannas, pisporê/a biyolojiyê

JI JOR BER BI JÊR

- Bizmarê mezin
- Cihê îbadeta êzidiyan
- Agir
- Cihê ku genim lê tê hêran
- Di ola îslamê de banga ji bo lîmêjê
- Bajarekî rojhilatê Kurdistanê
- Parçeyên reş ên li ezmanan digihên hev û paşê baran tê
- Ji niha û pê ve, ji vir û pê de
- Paytexta dilan, bajarê kurdan ê kevnar
- Şûn, şop
- Diaya ku li ser miriyan tê xwendin
- Ji bo kesên ku devê wan baş nagere û axaftina wan bi pîrsgirêkê e tê gotin
- Pêxemberek
- Tiştê ku jin pê çavên xwe dixemlin
- Sembola zivê
- Notayêke muzîkê

Bersiva hefteya borî

1	G	I	R				2	A	V	Î		
	I	E					3	A	X	Î	Ş	
	4	Ş	E	W	E	R						
			A				5	Î		Q	A	D
6	B	E	N	G	I	N			E	A		
		R		M			7	R	E	S	Î	
8	Î	D		Z				W		L		
	B			M	A	L	D	A	R	O		
9	A	V			O	Ş				10	N	A
	D			K	M							R
	E		11	Z	I	M	A	N	A	S		Î
	T			N		O						

'Helawa kurmancî erzan e'

Felat Nishtiman

Tevî astengî, zext û zoriyan li berê, kar û xebatên zimanê kurdî her diçe berfireh dibin. Li bakurê Kurdistanê bi taybetî salên dawîn di warên wêje, ziman, folklor, werger û lêkolînê li ser mijarên cihêreng de, gelek berhemên nivîskî çap bûn. Bi saya van berheman, bi hêsanî dikare bê gotin ku hem derfetên fêrbûn û xwendina zimanê kurdî pir bûne hem jî pirtûxaneyên zimanê kurdî dewlemed bûye. Xebatên ferhengî jî hin ji wan kar û xebatên zimên in ku ji bo pêşketina zimanê kurdî pir girîng in.

Ferhenga Biwêjan a ji aliyê nivîskar Dilawer Zeraq ve hatiye amadekirin jî yek ji wan ferhangan e ku ji sê cildên 'kurdî-kurdî, kurdî-tirkî, tirkî-kurdî' pêk tê. Ferheng di sala 2015'an de ji aliyê weşanxaneyê Lîsê ve hatiye çapkirin. Di her sê cildan de bi tevahî 18 hezar biwêjên kurmancî hene. Biwêjên di ferhengê de, li gorî mijaran jî hev hatine cihêkirin û kategorîzekirin: biwêjên resen, diayî, nifirî, rengdêrî, lêkerî û yên xweser.

Berhevkar û amadekarê ferhengê Dilawer Zeraq di ciwanîya xwe de bi dewlemendî û gencîneya biwêjên kurmancî dihesa û sala 1995'an dest bi berhevkirina wan dike. Di 20 salan de wî bixwe nêzî ji sedî 70'yê biwêjên ferhengê berhev kirine û yên din jî ji çavkaniyên cur bi cur wergirtine.

Stûna kurmancî

Dilawer Zeraq tîkildarî ferhenga

Biwêj yek ji hîmên sereke yên zimên in. Nexasim ev ji bo zimanê kurdî wisa ye ku ji hêla biwêjan ve pir dewlemend e. Nivîskar Dilawer Zeraq ku bi berhevkarî û xebateke dûvdîrêj a 20 salan, Ferhenga Biwêjan amade kiriye li ser girîngiya biwêjan axivî. Zeraq nêzîkatiya li zimên rexne kir û got, 'Helawa kurmancî erzan e'

biwêjan û girîngiya wan a ji bo zaravayê kurmancî axivî. Zeraq diyar kir ku biwêj yek ji stûnên kurmancî ne û ne ji biwêjan be nikare behsa kurmanciyê li gorî ruhê wê bê kirin û wiha got: "Biwêj yek ji gelemşeyên sereke yên zimanê kurdî ne. Heger mirov ne serwerê zimên be, nivîsîn û vegotinê kelî û tehmsarkî ye. Ji sedî 60-70'yê kurmancî biwêj in. Tu biwêjên kurmancî jê derîni, wê êdî ew bi kêrî tiştêkî neyê. Mixabin kurmancî di asta perwerdeyê de, ji aliyê gelek kesan ve nayê zanîn. Ji ber vê jî, ev kes nikarin zimanê xwe yê derbirîni (vegotin) ava bikin."

'Biwêj wekî xoxê ne'

Zeraq behsa pêkhatina biwêjan û taybetmendiyên wan jî kir û got ku di dîrok û gera jiyandê de; bi tecrûbe, lêqewimîn û bûyeran, agahî û zanîn peyda dibin; li ser wan jî qalibên biwêjan tên avakirin. Zeraq amaje pê kir ku qalibên gotinê yên biwêjan hem gramatik hem jî dergramatik in û ji ber vê yekê, ji aliyê qalibê gotinê ve anarşîstiyêke biwêjan heye û wiha pê de çû: "Biwêj (îdiyom) wekî xoxê ne, ji derveyî xwe ve nerm in lê kakil û dendika wan hişk e. Tu nikarî wan bişkinî. Bi rêya hostetî û derbirîna zi-

manî dikarî pê bilîzî. Di warê pêlîstina biwêjan de, gelek kesên bi kurmancî diaxivin an jî dinivîsin, hê negihîştine hostetiyê axaftina rojane ya 50-60 sal berê. Ev hostetî bi awayekî niha li gundan heye."

Di axaftina xwe de Zeraq da zanîn ku biwêj kengî destûrê bide, tu wê hingê dikarî wê biguherîni, wekî din ew bi kêfa xwe ye. Zeraq jî bo vê taybetmendiyê mînak biwêja 'dilşewatbûnê' da û wiha got: "Ew hevlekî dilşewat e. Di vê hevlekê de biwêja 'dilşewat' dibe rengdêr, angî diguhere."

Biwêj ji gotinên pêşyan pirtir in

Der barê cihêtiya biwêj û gotinên pêşyan de jî Zeraq aşkera kir ku pirtir caran ev her du beşên zimên tên tevlihevkirin û da zanîn ku biwêjên kurmancî belkî sê caran li gotinên pêşyan ên kurmancî ne û wiha lê zêde kir: "Gotinên pêşyan, hevokên rasterast in; hîn dikin, şîretan dikin, rê li ber dixin û tespitan dikin. Biwêj car caran tespitan dikin lê ev ne li ser armanca rêliberxistin, hînîkirin û şîretan e. Di biwêjan de mecaz heye. Di gotinên pêşyan de mecaz pir kême e. Herî zêde ji sedî 5 e. Biwêj ji sedî 95 mecaz in. Ew hem xwedî qalib in hem

jî di qalibên xwe de hil nayên."

Divê ruhê kurdî rizgar bibe

Zeraq da zanîn ku kî jî rola mantiqa qalibên biwêjan fêm bike, wê dikaribe xwe bigihîne zimanê çandî jî û ji bo em dikaribin bêjin "bi qewlê kurmancî" divê mirov beşek ji hiş û bîra xwe ji biwêjan re terxan bike; wan bixwîne û bi kar bîne. Zeraq axaftina xwe wiha domand: "Helawa kurmancî erzan e. Qad berfireh bûye, herkes dikare tê de hespê xwe bibezîne. Dibêjin qey hinekî fêrî gramerê bibin, zanîna xwe ya peyvan jî pêncsedî bigihînin hezarî, wê dikaribin nivîs, çirok an jî romanekê binivîsin. Belê dikare bê nivîsîn lê wê ew berhem çawa bin. Vegotina çirokekê tiştêkî din e, nivîsîna wê tiştêkî din. Her zimanek ruhêk wî heye; divê tu wî ruhî rizgar bikî; ne parçe parçe, bi tevahî."

Di dawîya axaftina xwe de nivîskar Zeraq

destnîşan kir ku wî bi vê xebata xwe biwêjên sereke yên hîmî yên wê tîra xelaskirina kurmancî bikin, berhev kirine û got ku heger ew keysê lê bîne wê hinekî din jî bide hev û hejmara biwêjan bike 25 hezar. Zeraq her wiha diyar kir ku biwêjên taybet/spesîfik hene, yên çandiniyê ku di tu zimanan de tune ne; divê ev biwêj bi taybetî werin berhevkirin.



Çima divê em li filmên sînemayê temaşê bikin?

Dijwar Kalhesinani

Armanca sereke ya lêkolînê zanistên civakî (psikolojî, civaknasî û antropolojî hwd.) fêmkirina siruştaya mirov û kûrahiya hestên wan e. Her wiha huner jî ne kêmi wan zanistan e. Salên dûvdîrêj huner jî nemaze wêje, bûye jêderê sereke ji bo hizirîna mirov da ku bersivêke maqûl derheqê mirovahî, exlaq, bawerî û ayînan de peyda bike.

Yewnaniyên berê huner dabeşî şeş cureyan kiribûn: mîmarî, mûzîk, nîgarkêşî, peykertiraşî, helbest û semagêrî (dans). Tevî ku di wê serdemê de û piştî wê jî şano berbelav bû, ew wekî beşek ji hunerê nedihat hesabandin. Sedema wê jî ew bû ku şano ji helbest, mûzîk û semagêriyê pêk dihat.

Piştî ku di dawîya sedsala 19'emîn de sînema hate keşîf kirin û

film belavbûn û wekî tiştêkî nû cihê xwe di jiyandê de girt, teorisyenê îtalî yê sînemayê Ricciotto Canudo navê curehunera heftemîn lê kir.

Canudo, dît ku ev şewaza hunerê ya nû, ew cureyên hunerê ku yewnaniyên berê dabeş kiribûn di hundirê xwe de dihevine. Sînema ku hunerke bitevger e bi awayekî hemaheng ew her şeş beşên hunerê -ku ji hunerên plastîkî, bihîzbar û ritmik pêk tên- li hev civandine û di encamê de curehunera heftemîn pêk aniyê. Gelo rola sînemayê ya di jiyandê de tenê ew e, hunerê nû û hevçerx e û hew?

Hêzeke xurt a filmên sînemayê heye ku bi temaşekirina wan -bêguman li gorî cureyê filmê- dikin ku hestên mirovî li mirovî xuya bibin. Ew wisa dikin ku bi hezaran heta bi milyonan mirov bigirînin yan xemgîn bibin; bikenin an jî hest bi bextewariyê bikin; bitirsan an jî bêne handan

ji bo serkeftin an bidestxistina tiştêkî. Pirsgirêk ew e ku em kûr li ser filmên sînemayê nahizirin û wê pirsê jî xwe nakin; ka gelo em ê çawa sînemayê wan werbigirin, da ku bibin alîkar ji bo têgihîştina jî xwe û kesên din. Divê hêz û girîngiya filmên sînemayê ya di warê têgihîştina mirov a hestên xwe de, têkoşîn û lêgerîna wateya jiyandê de neyê piştguhkirin.

Ka çawa yewnaniyên berê li şanoyê dinêrin, divê em jî wisa li filmên sînemayê binêrin. Filmên sînemayê ne tenê ji bo borîna demêke xweş in, aliyê wan ê fikrî û felsefî jî tîra xwe heye. Sînema, amûreke bihêz e ku dike mirov ji aliyê fikrî û ramanê ve zindî bimîne. Wekî ku Arîsto berê amaje pê kiribû; temaşekirina listikên şanoya trajedyayê roleke mezîna li xwe digire; ji bo mirov di hundirê xwe de pêdeçûnekê li ser hest û ramanên xwe bike û di encamê de bigihîje rîyeke rast ji bo kemilandina kesayetiyê xwe. Bo nimûne; dibe ku rola lehengê listika ku hatî temaşekirin, di jiyana xwe de şaşiyekê bike. Ev jî dibe egera wê yekê ku temaşevan piştî listikê diqede jî li ser bihizire û hêlengadinekê li ser pirsên wekî wijdan, exlaq, dilovanî û peywendiyên civakî di nav peywendiyên civakî de. Ev pirs jî bo temaşevanên sînemayê jî maqûl in.

Nexwe bersiva girîngiya temaşekirina filman çî ye? Mirov dikare wiha bêje; mirov divê hin serpehatiyan bijî da ku bi tecrûbeyên

wan jiyana xwe bi rêk û pêk bike. Film jî ew serpehatiyan ku mirov di jiyana xwe ya resteqînî de nejiyayî pê dide jiyandê da ku bigihîje zanîn û bi rêk û pêk bûnê.

Di gelek filman de peyamên rasterast hene ku nîşanî me didin li wê cihanê jiyana me, ne cudatir e ji jiyana kesên li derdora me ne. Em di filman de dibînin ku têkoşîn, tevliheviya hindurîn û derveyîna mirovan hema bêje heta radeyekê wekî hev in. Ev yek jî sîd û mifayekî dide me ku em jiyana xwe berawirdî jiyana kesên din bikin û di encamê de em çareseriyekê ji bo arîşe û girêkên xwe peyda bikin.

Bo nimûne, dema em li filmên ku derheqê lêgerîna kesayetiyê, hebûn û wateya jiyandê de temaşê dikin, em dibînin ku jiyana lehengê di filmê de, gelekî nêzîkî jiyana me ye. Yan jî filmên derheqê pirsgirêkên di nav jin û mêran de, yên derheqê malbat, zarok, evîn, debar, civak, welat, bindestî û hwd. de jî dîsa tê dîtin ku ne kêmi pirsgirêkên me ne. Bi vê yekê mirov bi ser ve dibe ku ne tenê ew tenêtiyê dijî yan jî dilê wê/î şikestiyê û derûniya wê/î ne rehet e. Ev yek jî dike ku aramiyê bi mirov re çêbibe û bizane ku rewşa wî ya acizbûna demkî ye.

Hişê mirov tîrî wê yekê nake ku jî her tiştê li hawirdora xwe têbigihê. Wexta li ser tiştêkî dihezîre û derheqê wî tiştî de agahiyan berhev dike jî bîpergalkirin û rastkirina wan agahiyan wextekê jê re divê. Lê filmên sînemayê di nav saetekê de yan jî du saetan de, heta bi dimenekî xwe dikarin ew tiştê di hişê mirov de wekî pirsêke bêbersiv mayî, bi awayekî rohin û aşkera pê bide têgihîştin. Şiyana filman

heye ku bikin em ser bi fikrekê ve bibin, an jî dest bi bizavekê bikin.

Filmên sînemayê jî me re dibin rêber da ku em ser bi girêkên xwe yên derûnî ve bibin û wan derman bikin. Filmeke baş dibe wesîle ku mirov hestên xwe û fikrên xwe çêtir derbibire. Sînema, dike ku ew tiştên jî ber xirecira jiyandê li ber çavê me neketine û hatine piştguhkirin em bi ser ve bibin û girîngiyê pê bidin.

Hewcedariya mirov bi nimûneyan heye ji bo qonaxên pîrcure yên gihîştinê. Ka çawa kesek dikare serkeftî be, yan jî jiyana wê/î de çawa biguhere û bi zor û zehmetiyan re de çawa bikare serederiyê bike, di filman de mirov dikare bibîne.

Sînema, berê me dide raman û nîskoka mirovahiyê ya hevpar. Filmên ku mijara wan mirov, çand û çirokên welatên din e, nîşanî me didin ku em parçeyek in ji jiyandê cuda yên li ser rûyê dinê. Ew çirok dibin alîkar ku em xwe nas bikin û bi rolmodelan nîşanî me didin ka çî girîngiya exlaqî heye û di warê tîkiliyên civakî û peywendiyên di nav mirovan de divê mirov çawa tev bigere.

Bi kurt û kurmancî her filmek tecrûbeyêke takekesî ye, lewra nayê wê wateyê ku hemû mirov heman wateyê jê derxin lê dîsa jî hin xalên bingehmî ên filman hene ku bi her kesî re heman hest û wateyê çêdikin. Ji bo em xwe, kesên li dora xwe û jiyandê nas bikin, filmên sînemayê wekî rîyeke tekûz li ber mirov in. Ji bo mirov di wê rîyê re derbas bibe, teqez divê li filman temaşê bike û li ser wan bifikire.

